

# TIREJ

## KOVARA ÇANDI Ü PİSEYİ

Hejmar:1 Sal:1979

VEXWENDIN / Serxas ARDA  
HELBESTÊN ROJEN BARNAS:

- Ez Mendaleki Çar Salime, Mamo!
- Melayê Şiretkir
- Jindari
- Bîbişire

KUDA DÎCIN? (Çirok) / M.ŞEFİQ  
CAR ZANE, ZER ZANE,ZOR ZANE  
(Çirok) / Feridûn SALAR

HELBESTÊN MEM RONGA  
JI NAZIM DU HELBEST  
ESTANEKA MÊŞNA

(Çirok) / Sabahattin ALİ  
ZARGOTIN  
FERHENGOK





# TIREJ

KOVARA ÇANDI Ü PİSEYİ

Hejmar:1  
Sal:1979

têxistini

RABER KIRİNİ ..... 3

VEXWENDIN / Serxas ARDA ..... 7

TE Vİ ZMANİ JI KU DERE ANİ? (Serbüriyek) / Flit TOTANI ..... 9

*HELBESTÊN ROJEN BARNAS :*

- Ez Mendaleki Çar Salime, Mamo! ..... 15

- Melayê Şiretkir ..... 17

- Jindari ..... 20

- Bibışre ..... 21

KUDA DIÇİN? (Çirok) / M. ŞEFİQ ..... 23

CAR ZANE, ZÊR ZANE, ZOR ZANE (Çirok) / Feridûn SALAR ..... 27

*HELBESTÊN MEM RONGA :*

- Bihar Pêşiyê Tê Li Helbesten ..... 34

- Deriname ..... 35

*Jİ NAZIM DU HELBEST :*

- Ayê ..... 36

- Strenên Me ..... 38

ESTANEKA MÊŞNA (Çirok) / Sabahattin ALİ ..... 39

*ZARGOTIN :*

- ŞİRETÊ KALÎ (Çiroko Geli) ..... 43

- ŞERÊ XALITA (Stranek Jî Wêseya Geléri) ..... 46

- LAWIJ ..... 47

- ZAZAKÎ DIR VATEY VERİNAM ..... 49

*FERHEN GOK :*

- KURDİ - TIRKİ ..... 52

- ZAZAKÎ (Dimili) - TIRKİ ..... 56



# RABER KIRİNİ

Xwendevanê Berêz,

Her netewe, gel heta eşirek jindar, lî dînê; xwedi zman, zar-gotin (folklor), wêje (edebiyat), bî kurtayî xwedi çandekî ye. Û disa ev netewe, gel û eşirêñ ha hilberiyêñ çandeyêñ xwe, bî nivisani dî nav xwe de belav dikin, raçigîhinin gel û netewe-yêñ dîn, yêñ lî ser rîwê dînê.

Azinêñ (metod) belavekîrinê, dî her derbasok û gehinekê dirokê de cur bî cur, celeb bî celeb in. Geh bî dengbêji, geh bî nivisani -bî rojname, kovar û pirtûk- û herweki dî heymana me de tê ditin bî radyo û televizyonê hilberiyêñ çandeyi hatiye belavekîrin, bî belavekîrinê re hatiye pêşvebirin, lê zédekirin.

Dî nav van navginêñ (wasitên) belavekîrinê de ê yêmayî (kalıcı) û ajobêna (süregen), yê nivisani ye.

Nivisanîya me i piştî İslamiyê, ji sedsaleya deh-yanzdem destpêdike: bî Eliyê Heriri, Melayê Cezeri, Feqehê Teyran... ú.h.w.d.

Wendoxê erjayey,

Dina di hergu netewe (millet), gel (xelq) heta hergu eşiri wayirê zıwani, folklori, wêje (edebiyat)i, kirra qalî wayirê çande (kultur)i ya. Fina ay netewey, geli û eşiri çandeyê xwi bî nuştîş, xwi miyan dî vila kenê, resnenê netewanê binanê kî riyê dina sero yê.

Metodê vila kerdişî, wir vêr û demê diroki (tarix) dî tewir bî tewir i. Ge pey dengbêjan, ge pey nuştîş -bî rojname (qezete), Kovar (dêrgî) û pirtûk (kitab)-ow sekî çaxê ma dî haseno pey radyo û televizyon hîna weş vila biyê.

Mîyanê nê wasitanê vila kerdişî dî mendox û domdar adê nuşte i.

Bîsilmaneyey ra naşta nuşteyê ma seserra des-yewendesini ra dest bider keno: Bî Eliye Heriri, Melayê Cıziri, Feqiyê Teyran ow ay bini.

Peymande (miras) yê ma o folklori, peymendeyê ma ê nuştîş ra vişér û herayêr o. La çî

Jêmayeya me i zargotını, ji jêmayeya me i nivisani balûpal û rengintir e. Lê mixabın, ku em ji niha ve lê xwedi der ne kevin, berhev û biserûber ne kin, roj bî roj wê winda bîbe, bîhele. Em dê mina zîlamên naçakê miratxwir destê xwe bîdin ber riwê xwe û ax li min bavo kin.

### Xwendevanên Berêz,

Va em; bî pêsbira lêxwedi derketinâ çandeya me i jêmayeyen kevnare (klasik) û geléri, derdikevin. Dî aliki de vê jêmayeyê xwedi kîrin, parastin; dî alyî din de lêzêdekirin û pêşvebirin. Ev dîviyâhiyek cîvaki û berpirsiyariyek diroki ye ku xwe bî dijwari dîçin pêjnandin.

Bî vê derketinê, perpirsiyariya xwe ya arîzi ya diroki bî cih tinin û heta hoyen (çertên) me dest bîdin, em dê li perpirsiyariya xwedi ha xwedi derkevin. Lê ji derketinâ hejmara pêşin pê de, hînek berpirsiyariyên gîringtir he ne ku, ev ji yên we xwendevanên berêz in.

Pardariya we i gîringtir ci ne?

Bî kurtayi ev in, xwendevanên berêz!

1. Ne ku hun tiqûtenê hejmare kovarê bikirin, bo hemberriya hemberan. Lê ji rêza rûpela pêşin heta rêza rûpela dawin, bî hedan, bî çavê têgîhiştinî û lê rexnegiriyê bixweynin. Dibe ku bi xwendina Kurdi-ji ber qenc ne hinbûyini- dî destpêkê

fayde ki, ma nîka ra pey wayir nê vejim, arê nêkerim ow sere-rast nêkerim se, roj bî roj vindî beno, vilêşeno. Ma bedi zey mîrdimanê nebaşanê miraswan vanim «ax li minê bavo» ma dest ra vejêna.

Wendoxê erjayey,

Ma semedê wayiri kerdişê peymendeyê çandeye klasik û gelêriyê xwi vejiyênim. Kişti ra ni peymendi ri wayiri kerdiş, pawitiş kişi bin ra zi vêsi kerdiş û aver berdiş. Na lazimaya cematkî û yew berpirsiyari (meseletey) ya dirokiya li zortkanî xwi dana eşnawitîş.

Bî ni vejiyayî, berpirsiyariya xwîna arîzi ya diroki ma anim ca û heyana ki ma dest ra bêro ma ku na berpirsiyariya xwirê wayir vejim. Labrê vejiyâşê ümar (hejmar) a veren ra pey, tayi berpirsiyariyê hîna gîringi (muhim) estê ki ê zi ey şima wendoxanê erjayanê.

Pardariyê şimayê en gîringi çîna yê?

Kirri reydi nê yi, wendoxe erjayey!

1 — Erinayışê ümara kovarı tikûtena nê, Labrê xêza riperrê verni ra heyanê xeza riperrê peyni, bî sebr, bî fahmkerdiş û bî rexnegir (kritik)i biwanê. Beno ki verni dî wendîşê Kirdki -semedê weş nê musayış-serey tay wendoxanê mayê erjayan bidejno (bitewno). Hewna (rayna) lazimo ki eni embazi qerari reydi, rikkî reydi wendîşê xwinê

de serê hînek xwendevanên me i berêz bêşê. Disa ji dîvê ev hevalin dî hedar (qerar), bî rîkoyî (inatkari) xwendina xwe i Kurdi, bo pêşvebirinê her û her bî cadinîn, bîdominin.

Tika (reca) me ya pêşin û gîring (muhim) ev e.

2. Piştî ku her hejmarek hat xwendin, bête bixwendin bî heval û hogirinê dîn ku, hejmaren kovarê ne ketîne destê wan, an ji ên ku bî dest ne xistine. Ü disa hevalên ku dî xwendina Kurdi de têr û xurt in, dîve alikariya wan hevalên qels, dî xwendina Kurdi de bîkin.

3. Dîvê, hevalên pênuşgir û hînermendên dî warê nîviskari û helbestkariyê de hilberiyên xwe jî me re bîhinêrin. Hevalên wîsa hene ku jî berê xwe ve hilberiyên zargotin (folklor) a Kurdi-herweki çirok, çirvanok, metelok, tiştanok, kilam, dilok, payızok, lawij, gotinêne pêşîya-berhev kırine û hê jî berhev dikin. Hêviya me jî wan hevalên berêz ku nîviştek (nusxayek) jî wan berhev kîriyên xwe, jî me re bîşinîn. Lewra ev gişt, ci ên afîrandi, ci ên berhev kiri, hilberiyên çandeya netewê me ye.

4. Destpêkirin jî me, lê domandin bî we ye. Kîl û kêmasyîyen me bê şîk wê hebin, û gen-gaz (mumkin) e ku em lê ne warqîlin. Lî, li wan kîl û kêmasyan bî rexneyên xwe i héja me hisyar kîrin, berpîrsîyariya we ye. Hûn dê van kîl û kêmasyîyen

Kîrdki timûtîm aver berê, dîwîm bikerê.

Tika (reca) ma ya verên û gîring na ya.

2 — Wendişê hergu ûmar ra pey, bîdê sowbi embazan wendîş. Ow gîlana (heyna) embazê kî wendişê Kîrdki dî zanaye yi lazîmo ardîmê wendozanê kemzanayan bikerê.

3 — Embazê kî destê inan pénus (qelem) tebişeno û warey nîviskarey (nuştoxey) û helbastvaney (şairey) dî hunermendi lazîmo nîviştanê xwi maret raykerê. Embazi estê kî verina tebayê (çiyê) folkloriyê Kîrdki -sey çirok (hikaya), estanekî, metelok (fiqra), çibenok, derdo, deyir, dûrik, deyirê zerri, vatey-verinan- pêser kerdi ow hima zi arêkeni. Hêviya ma eni embazanê erjayan ra na ya kî: yew (jew) nusxa niyan ra marê bî erşawê. Çimki niy heme, ci virâstey ci arêkerdey benê hilberiyê çandeyê neteweyê ma ye.

4 — Destpeykerdiş (Destpeykerdenî) ma ra, labrê ramitîş pey bî şîma wo. Kemaney bê guman benê ow beno kî ma hagidár nêbi. Bî rexneyanê xwinê erjayan eni kemaneyan ra hêşyar kerdiş berpîrsîyariya şîma ya. Şîma eni kemaneyane ma ca kerê, bî sebebanê xwi reydi marê bî erşawê (bîrisê) şe ma zerwes (bextewar) benim.

Wendoxê erjayey,

Na yew kovara çandeyi ya.  
Her gama ya (ca)y qandê aver

me bîpêdinin (tesbit kîn), dîgel egeriyêن (gerekçen) wan jî me re bişinîn, em dê bextewar bin.

Xwendevanêن Berêz,

Ev kovareki çandeyi ye. Her pêgaveki wê xîzmet û xebat e, bo pêşveçün û qelew bûyîna çandeya Kurdi, û bo zmanê nîvisaniyê.

Em rêpaniya alikariya we dîkin, rêpaniya alikariya we i: bî xwendin, bî nîvisandin, bî belavekirina dî nav geli û bî lêxwedi derketini.

Bî gîramên me.

şiyayış û qelewbîyayışê çandeyê Kîrdki ow qandê ziwanê nuşteyê Kîrdki Xîzmet û xebat a.

Ma pawîbê ardîmê şîma yim, ardîmâ şîma: bî wendîş, bî nuştiş, bî vîla kerdişê miyanê geli ow wayîr vejiyayîsi reydi.

Bî gîrami...

TÎRÊJ

TÎRÊJ

# VEXWENDIN

Serxas ARDA

Bê şık mina her gel û neteweyên li dînê em ji xwedi çandeki ne. Zmanek, muzikek, zargotnek (folklor), wêjeki (edebiyat) me ji he ye. Weke her tişti, her büyeri ew ji hewcedarên xwey bûn û xwedi kîrinê ne. Bî xwey bûn û xwedi kîrinê pêş ve dîçin, dîgihijin, dîkemilin.

Dî warê zman de, bê fikare em dîkarin bêjin ku: Kurdi, dî bersiv dana her dîviyahiyêñ wêjehi, siyasi, abori û felsefi de têrkir û fereh e.

Dî warê zman de, bê fikare em dîkarin bêjin ku Kurdi, dî bersiv dana her dîviyahiyêñ wêjehi, siyasi, abori û felsefi de têrkir û fereh e.

Kurdi dî raçandina bêje û lêkeran de zmaneki zayok e. Dî bêjezanî de xurt û dewlemend e, nemaze dî bêjezanîya navdêrên kesdari (muşaxas) de.

Zmaneki bî xwedi kîrin, dî her wari de bî bikaraninê bitir dibe, dîgihije. Zman ji tişteke jindar e; bî xwarin, vexwarin, xwedi kîrinê diji, bî filhtandina ji eş û jandarıyêñ xwe i arizi bijündar dibe.

Vejandina zmaneke; digel zmanê axaftını, bî pêşvebirina zmane nîvisandîniyê ye, ku ev; zmanê weşandîniyê û wêjeyê ye. Drûvandini bîvê, zman weke sindanê hesinkêr be, zmanê nîvisani ji nola kerane û geran e. Sindaneke ku demeke dûr û drêj ji mîzdana kerane û geran dûr keve çawa biçilmise, zenga kevnariyê û perpûta mîrinê bavêje ser çavê wi, wîsa ji zmaneke ku ji axaftîniyêñ rojane û bikaranini ya nîvisani dûr bimine dimerise, dikurise, dîçilmise.

Hînek kes sedemên ne axaftına xwe i kurdi, bal bî têr ne kîrina kurdi, bo serwext kîrina daraz û daxwazîyêñ xwe ve grêdidin. Hîn

jê ji bî nefspîçûkîyêk jî parsûstûri, bî bersiveke hêsan xwe difilîtinin:  
«Em hatine xunifandin (asimile bûne).»

Belê! «Nîzanîm, hêsanîya canim.»

Bê şik ev herdû bersiv ji, ne dî cih de ne. Û jî bîni çewt in.

Siyaset bo çare ditin û bışkaftına gelş (mîşkîl) û pîrsiyarêñ cîvaki têñ kîrîn. Rîyén bışkaftinê bî zmanê wê cîvakê têñ gotin, têñ ragîhandin. Lî hîn jî van siyasetgeranêñ me bî geli re ne bî zmanê wi, bî zmaneke dî dîvên bîaxîfîn. Bî zmanê ferma.

Gengaz (mîmkîn) e ku meriv dî bîn nirê li-xwe-xunifandîni (asimilasyon) yê de, bî makezmanê xwe têr û tekûz nîkarîbe daxwaz û darazén xwe ragîhîne, yêñ pêşberê xwe serwext bîbe. Ev dîbe ne jî akama (tesira) li-xwe-xunifandîni be, lê jî ber devokêñ pêwari (lokal) be ji. Her jî çi sedemi dîbe bla bîbe, ma gelo dîvê ku em li berê, destgrêdayî û stûxwar bîminin. Bê şik na! Dîvê em dest bavêjin vê pêvajoyê (süreç), bî vênek (iradeyek) xurt, xwe jî vê tralîyê dawesinîn. Vatîni (vazife) ya me i mîjûyi (tarihi) ev e.

Gelo em lihêviya çi ne, an ki ne...

Ku em bî zmanê xwe ne nîvisinîn, wêjeya xwe ya heyi ve ne jînin, zmanê xwe i nîvisani fereh ne kîn, pêşve ne bîn, wê ki bê vejîne, fereh ke, pêşve bîbe? Jî kijan bejê (qitayê), peleyê (ülke) wê ki bêñ?

Ev vatîniya me ye. Em ki ne? Ez im, tu i, ew e, karkêr exwen-dekar e, rewşenbir e. Bî kurtayî em in.

Fermo! Werin em li hêviya we ne.

## **... Te Vi Zmani Jî Ku Dere Anî?**

**Flit TOTANI**

Mêvaneki min he bû. Dîviya pê re biçim Dîyarbekrê. Her çi-qas pê re çuyîna min dî ali işe wi de, wê tu bikêri wi ne hata ji, lê disa jî bo qinyata dîlê qi dîviya pê re biçim.

Me xatir xwest û em jî malê derketin. Zaroyan li pey me avê rêtin, dîlêne me ket cih. Pişti av rêtinê ne ma êdi tîfaq û teşqeleyen bênen serê me. Oxıra me vedibû édi. Ez bisirim. Mêvanê min, Mirxoyê Xano li min zîviri: «Herê herê... bavê bavê min tu çîma dê ne keni, zani êdi pişti vê avrêjê tîfaq û teşqeleyen li pêş me pûç bûn.»

Bî axaftına Mirxo re dengê selavdaneke jî pişt me ve hat. Lî hîndava dengi zîvirim, Mele Mihemmed Eli...

— Rojbaş Mela! Çawani, qenci gelo?

— Hemdê bê hed bo rebbilalemin, exi. Dî intizara roja xwe de ne. Hema Xwedê jî imanê û qur'ana ezimuşsan mehrûm ne ke. Ev exiyê me ki yê?

Mirxo xwe ra ne girt. Gotê:

— Na bavo ez ne xi me, ez cibri me.

Min gotinê jî ber Mirxo hilani:

— Mêvanê min e.

— «Ya... Ser çavan. Gelo sîheta te çawa ne exiyê min?»

— Spas. Tu gazineke min ni ne jî ali xweşîya min ve.

— «Elhemdülillah summe elhemdülillah. Rebbilalemin kesi neke bin darê sihhetê. Rebi muinê te be. Zani exi bê teqdîra qehhar, tu ziruh nîkare hereket bîke. Enkebût daxi bî teqdîra qadîrê mutlaq

dikare biliye. Sanieki, hakimeki wîsa ye ku bê misal e, layezal e, (bi zanyari bisiri) maşaallah eqlê meriv nagihije hikmetê zulcelal.»

Mîn gotina Mele bîri:

— Belê Mele!

Mele dev ji axaftina xwe ber ne da:

— «Maşaallah li hikmetên zulcelal bînihêre kuro, ci qas hubba te dî dilê mîn de he ye. Fesuphanellah ji te qadıri re, ji xwe tu qadîrê kulli eşyayı, lê wellahilezim bî qasi hubba te dî dilê mîn de ye, ew qas yê tu kesi dî dilê kesi de tu ne. Xarîcê imkan e. Rehm û xufrana xeffar, cenahê xwe ji ser serê te sayei hifza xwe mehrûm ne ke.»

— Ji te ji Mela.

Mele Mihemmed Eli qet dengê mîn ne bir xwe. An ji ne dixwest «tekelluma» xwe bibire. Bê zordana xwe, bêjeyên (kelime) erebi, farisi yên belbi hê ruyê tavê ne ditîbin ji tûrikê birpêbirinâ xwe derdixist mina çavikên rêtina tentena bî hev vedikir, dirêst. Hiz, rûmet, siyanet tenê bî van bêjeyên bîyani (xerib) bihatina dazanin.

Lê malava de ka ev islamiyeti ye? De ka ji kitêbê şerietê re, tê gotin «pirtükê şerietê». Kitêb kitêb e, pirtük pirtük e. Xwedê mûinê te be çawa ye, Xwedê alikarê te be çawa. Dî mûinê, inayetê, muawenetê de hézeki xwedayi he ye, veşari ye. Lê alikar?...

Em hatin serê sêriyana nav çarşiyê. Mîn xatîr ji Mele Mihemmed Eli xwest, ez û Mirxo ber bî rawestingeha minibusa verêbûn.

Çarşıya mezîn ji boşahiya (izdiham) merivan seremişt bû. Ji çûnehatê mina qula mûristanê dîkeliya.

İsmet efendi dî nav derê dîkanê de li piya rawestabû, li çûnehatâ rê dimeyîzand. Me selav li hev kîr, İsmet efendi destê xwe drêji mîn kîr, me bî destê hev girt, hejand. İsmet efendi:

— «Bûyrın, çayeki me vexwê.»

— Gelek spas. Em rîwi ne, diçin Diyarbekrê. Dî me bibûre.»

İsmet efendi:

— «Allahaşqına, bûyrın efendi abêcixim çayeki me vexwe, disatê heri.»

— Ne, li me heliz e. Dîvê em pêki zûtir biçin.

— «Temam, temam efendim. Iuuñ navê wi ci ye ezê telefûn kîm, ku teqsi rabûse bla bê we hiline.»

— İca bû. Spas.

Em derbasi hundirê dîkanê bûn. İsmet efendi derbasi masa xwe bû, sandalyê nişani mîn da, ez derbasi sandalyê bûm, li sandalyê rûniştüm. Mirxo ji li ser kursi bî cih bû. İsmet efendi li cama camekana dîkanê xist, lawîkê çayger lê nihêri, İsmet efendi bî tiliyan jê re işaret kîr, sê çay xwest. Drêji telefonê bû, rawesta, bî destek pakêta

cixarê drêji me kîr. Mîn û Mirxo heryek ji me cixareki ji pakêtê hilani. Mirxo bî hestê xwe xwest cixara Îsmet efendi vêxe. Îsmet efendi ne hîst. Gotê.

— «Efendim, ew duyê çakmaxê te ji sîheta insan ra zerarli ye.» Û pê re hesteyê xwei gazê jend, cixara xwe vêxist. Telefon derket, Îsmet efendi axaft:

— «Alo! Bay Nûri, ez Îsmet efendi. Du yolciyê mîn he ne, teqsiyê Diyarbekrê he ne, tu ne ne? Heta yarım seetê himmm. Baş e efendim baş e. Tu du qoltîx ayırmış ke, bîşine ber filîpis (Philips) bayii. Bû canim. Haydê canim iyi gunler.»

Çayên me hatin. Çayger, çaya heryeki ji me da berê.

Mîn ji efendi pîrsi:

— Çawa danûstendîna we çawa ye? Fîrotına we dîbe, na be?

Îsmet efendi lêvê xwe çîlmîsand, bî niv mirûzqusandîn got:

— «Sayın abêcîxim, ê me emekeki lîzûmsiz e, em pê re dîbinin. Hiç yoqsa çar-pênc milyon eşya dî hundir de he ye, lê satîş na be. Efendim insanê vi memleketi alışmîş sefaletê, pisitîyê bîye. İmkansız efendim imkansız e. Ji me re medeniyet lazîm e. Mêrik ber pireka xwe na keve, yaxut bî pireka xwe inanmış na be, ku çamaşır makînesiki bikire, çamaşırê malê pê yiqamış ke. Mîn sê muzik dolabi anî, şes meh wîsa li dîkanê ma efendim. Yeki jê jandarma qomitani kiri, me yeki da doqtor, yek mabû ew ji rojek xanîma qeymeqam hat çavpêket, me da wê. Bay Selim ekmek aslanın axznîdadır, ekmek qazanc kîrin guç bîye. Qazanca mîn i rojê yırtmış bîke rojê ji bisti berjor na çê, lê êloxli dî rojê de çarsed pênsed hezarî qazanc dîkin. Mîn ji bayieki tanış ra dûrima xwe şikayet kîr li İstenbolê, çi bêje begenmiş diki; got «qardaşım çurumiş dibi.» Gércekten ji em çurumiş dîbin li vê derê. Sayın bay Selim, ticaret işekî qolay nine birê mîn. Ellah wekilin olsın niha sed hezar alacaxê mîn he ye dî nav xelqê de. Bavo kes çabûq çabûq nayne borcê xwe na de. Gere tu istek biki ku hê bine. Du roj berê sed û pênci û çar hezar bonoyê mîn hebû, mîn çû ji yabanciya, ji esnafa borc stend û udemiş kîr. Banqa Muduri rojek ertelemiş kîr, li mîn beklemiş kîr. Babam bû insaf degil.»

Teqsiki gewr li ber dîkanê rawesta, li qlaksonê xîst, şofêr bî işa-retan bangi me kîr. Ez û Mirxo rabûn. Mîn bo çay û her tiştî spasi Îsmet efendi kîr û xatîr jê xwest. Mirxo ji bî destê wi re girt, malavayı tê da.

Em ji dîkanê derketin, rîza pêşin ji me re hîstibûn. Mîn derê pêşin vekir, ez û Mirxo derbasi cihê xwe bûn, bî cih bûn. Teqsi bî re

ket. Me disa bî dest hejandîni xatîr jî İsmet efendi xwest.

Teqsiya me berbajarkê qesebê li pey xwe hîst. Bî bezahiya xwe re babeliska xubarê jî axê hiltani. Erebênu ku jî hember me dihatin mina berikêne tifingê, bî vizin dî me de dibihirin. Jî hafê ve me didit, lê dî li hev derbas bûnê de bî qasi çav niqandîneke sıvîk jî hev dibihirin.

Rêwingiyek li paş rûniştî, bî dengek fetîsoki û bî borin jî ajoyê teqsiya me pîrsî:

— «Mîn tişteki bîhist Felemez, êra rast e?»

Ajoyê me, dî neynîka paşvedinê de lê nîhêrt.

— Çawa xalê Haci?»

Haci:

— «Kufareti guna be, dîbêjin te şevê dî tîfaq derbas kîriye.»

Ajo:

— «Xwedê ewladê te bîhêle, Xwedê te xwey ke. Welle te di qeder e.»

Rêvingiyê kîleka Haci ket nav axaftinê:

— «Êra kufaret be Felemezo, xér be ci biye?»

Felemez:

— «Lo heyra tiştê awa tîm li pêsiya me şofêran e. Gotineke me sofêran he ye: şofêrin eceli yol, qarisi düldür. We diye ku şofêreki di nav cih û yataxê xwe de mîriye? Na ... Mîn bî xwe ne bîhistiye, ne ditiye ji. Jî xalê xwe i Haci re bêjim: Çûbûm Sêregê, mîn işê xwe bitirmış kîr, gorîşmê xwe qedand, édi dommişî Diyarbekrê dibûm. Hatim ber terminalê, Ellahû alem Amsar gote mîn; «himin dici, yolciyê mîn he ne bidim te, bîbe.» Mîn jî xwe ra got himin diciim hiç olmasa vala ne çim. Wele mîn yolciyê xwe bindirmış kîr û bî rî ketim. Em hatin dî qereqola Qerejdaxê de gêçmiş bûn, li wê derê çend wiraj he ne, em jî birinci wirajê gêçmiş bûn, li ikinci wirajê donmış dibûn ku jî úzaxê sileh sesleri me dûymış kîr. Silah sesleri çawa dihatin... Mîn basmişê xazê kîr û son surat yola dewam. Ne olır ne olmaz te di kim bîlîr belki mehkûm bûn weya yolkesen bûn. Wele mîn da xazê. Erebe dî binê me de üçmiş dîbe. Em yoqışê tîrmanmış bûn, derketin tepê, ci bîbinim; çar sed-pênsed metre pêsiyame qamyoneki megersem çarpmışe pezê koçera biye, pez sahibleri ji bî tifinga saldurmışe şofêrê qamyonê kîrine. Mîn basmişê frêne kîr, eyb e, eyb a ku frêne tütmış bike tu ne. Mîn xazê kesmiş kîr, bereket vîrsin li saxê rî çaqıl hebûn. Wextê ku asfalt dokmiş kîrine, li ser asfaltê ev çaqıl baş sıqışmış ne biye, ereba itmişî kenarê cadê kîrine.

Wele mîn direksiyonê kırmışê saxê, doxridan doxriya çaqılın üzeri kır. Neysem Elah bin bereket vêrsin yawaş yixa mîn kesilmiş bû, mîn vitêşê kuçultmış kır, hatim nêziki wan dûrmiş bibim yolciki mîn go; basmışê xazê ke, van koçera dijmînê me ne, zû me se, bîlezine, gidi zû. Mîn erebê taqmişê ikinci vitêşê kır û suret dayê, û dewamli lî qornê xist, disa ketim orta cadê. Dî orta rê de termê qoyineki hebû wele mîn lî ortê xist û derbas bûm. Em ji wan gêçmiş bûn, mîn yekcar sureta xwe zêde kır, birden çi bîbinim qurşûnê tîfînga dî ser serê me de çawa ûçmiş dibin. Dayê dêranê megersem wan dijmînê xwe i dî erebê de tanımış kırine, wele ji ecel qorqisi mîn xîz dayê.»

Felemezê ajoyê me, serpêhatiya xwe ji niqtén heta bîhnokê bî rê û zê dikir digote me. Lî fetlanekê çawa ji rê derketine, çawa disa bî heft kul û heft belayi navgina xwe derxistine ser rê û bî rê xisitne, yek bî yek, mina bengeke (imajeke) sinemayê ji me venepeni dî ber çavê wi de derbas bîbe digote me. Serpêhatiya wi ya duhi gelek drêj, rengin bû. Digot, digot, digot paşı lê ne tani. Paşı lê aninê ne dixwest ji.

Em lî Diyarbekrê, lî Derê Çiyê peya bûn. Mîn ji mîvanê xwe i Mirxo pîrsi:

— Çawa réwitiya te çawa derbas bû? Jê kîfxwes i?

Mirxo lî mîn nihêrt:

— Révitiya mîn xwêş derbas bû. Lê Siloyê Sarê hat bira mîn.

— Çawa?

— Tu zani, Siloyê Sarê gundiye me ye. Ji lejkeriyê ziviri, mina herkesi çûn bixêrhatina wi ji. Pîrsa wi kîrin, Silo bî tîrkiyek nîr bersiva me dîda. Me digot «Silo lawo bixêr hati», Silo xwe pîk dikir digot «saxol», «ellerinden upmiş dikim». Hîmm, me nihêri ku Silo xwe lî tîrki datine. Mirzoyê Misto jê pîrsi: «Silo lawo, çawa gelo tu hini tîrki bûy ne bûy?» Silo gotê: «Lê çawa ugrenmiş kîrimê.» Mirzo je pîrsi: «Xwedê ki bî tîrki ji kêça re çi dibêjin?» Silo da hîşê xwe, bibir nani, lê ne bû ku rastiya xwe bêje me. Mirzo pîrsa xwe cari kır. Silo lê ziviri, gotê «Oooo! Xwedê jê razi tu çûyi pey tiştê hûrik keti.» Mirzo bîşiri: «Bî xwedê ki ji hêştura (deve) re bî tîrki çi dîgotin?» Silo awire bî lejkeri da «Oooo! Xwedê jê razi, tu ji tiştê ew qas uskek sormış dîki» Flitê Ferho ket nav axaftinê jê pîrsi: «Êra bî tîrki ji kera re çi dibêjin» Silo bî zanyari bîşiri: «Bera hun cahil mane oxîl, lî wi welati ji kera re êsek dibêjin» Flit: «Lê dasê wan re?» Silo da bîra xwe bî bir nani. Bî kovan serê xwe hejand: «Wele bî piçûki toqinmişê wan ne dibûn heta buyumiş dibûn, ku buyumiş dibûn ji wan re ji dîgotin êsek» Pixkin bî civatê ket, kîst kenin.

Dotira rojê me bîhist ku Silo ji Sêva jîna xwe re gotiye: «Sêvê Sêvê!. Êsek qızı êsek indir hevani getir o nani» Êêêê... Sêvê yeka mîrane ye, dîbin gotina wi de, ma dîmine, wê ji gotiyê: «Hey la teres! Min ri ser wi zmani, te ji ku derê ani?»

— O... ê! Mirxo...?

— Ê ú ê. Mele Mihemmed Eli, İsmet efendi û ajo Felemezê we dewsa Sliyê Sarê girtine.

— Lê tu, Mirxo?

— Hema ez ji Sêvê, de tu ne raziyi ji wan re bêje.

## **Helbestêن Rojen Barnas:**

### **Ez Mendaleki Çar Sali me, Mamo!**

Ez mendaleki çar sali me, mamo!  
Ez, mendaleki çar sali  
Lî kolaneke Mehhabada xopan name  
Lî kolaneke Mehbabadê  
Kolanên Mehbabadê xir û xali

Roj  
Mina kloreke rûni, jî genimê sorgul  
Ku dî tendûrê de sorgiziri  
Dî şebaka me de,  
    lî rohilat  
    lî esman  
        jî min re  
Weki bışirandinên dayika min  
    dibisiri  
Ü

Ez nîzanım çawa bû, mamo!  
Çarşeveki ket navbera me  
Mina cubê İmam Xumeyni tari  
    çarşeveki reşvegeri

Ü  
Mina tavanê teyrokê  
Agır bari  
    jî balafiran  
    bî diyari  
        yê sala mendala  
            lî me

Ez mendaleki çar salı me, mamo!  
Dı sala mendalên dînê de  
Ez mendaleki çar salı  
Lî hewşê  
pîtik lî ber dil  
pîtik lî hembêz  
laşeki  
Laşeki pari bî pari  
cenge cenge  
ji bombên mêtîngehkari

Ew laş,  
Yê  
Dayika  
mîn e.

Ez mendaleki çar salı me, mamo!  
Ez mendaleki çar salı  
Ragîhînîn Dehakê vîrni İmam Xumeyni  
Bêjne:

Te Mehabadê xopan kîr,  
lê

Lî ser kavilê  
we  
mendaleki çar salı

Nîha  
bî ava kırna  
Mehabadek nû  
bli

Ez mendaleki çar salı me, mamo!  
Ez mendaleki çar salı  
Ez, nîha malokan çê dikim ji xwe re  
Ezê ji malokan ava kim Mehabadê  
Mehabadek ku:

Jî avahiyêñ xwêdana mün xemili.

## Melayê Şiretkir

Seydayê delal!

Ê ku dî civatan da bî galegal

Û li ber şireta pehn...

Me,

«Ad û Semûd» bîhistin,

Jî keştiya Nûh, ta xewarên şikeftan

Keftelefta Müsa li hember Fir'ewn

Qewmê Lût,

Û jî bîl çakûçê dî stuyê pût ve

Meteloka Harût û Marût.

Jî heft qorê dojeha bînerdi

Ta heft qorê bîhiştê li esman...

Smail û Malik,

wek li nîk

me bin

Em, ew qas pê dîzanın.

Bese êdi ev galegal,

qılqılın,

şiret

û gazin.

Bese qurban!

Dakişe jî «Lamekan», were xwarê

Were dînê,

Qasek li insan,

li mirovan mîzeke, fermo!

Jı wan,  
Jı me re minakıyan werine  
Ku kedxuri,  
Zordesti û sitemkari  
Çito tawan in.  
Û çito gunehkarı ye seri xwar kırın,  
Bı razi bûyına sitembariyê...

Mûsa û Harûn  
Zarokên Imran,  
çawa filitandin mirovinan  
Jı binê nirê zordestiyê,  
Û hînermendê xwedi gopal, jı bo wan  
Çawa têkoşineke mezin i gîran  
Hîlgirt ser milê xwe, û pêk ani  
Û da pêşîya dilan  
Wîsa  
Tu ji  
Minakıyan bine jı me re  
Minakıyan werine,  
yên bén fesalê  
Yên ber bı his bın, yên ber bı mîji  
Û bide pêşî  
Fermo!

Qora me fere ye, lî ser rastiyê  
Xebatkar in tê dê seraser.  
Tê de, ne Qarûn, ne Fir'ewn, ne Azer  
Ne Ebrehe û Ebûsufyan...  
Lî pozberê wan  
Lî pozberê wan evêن dî zeman  
em...  
Bı berberi,  
em...  
Bı birûbaweri,  
em...  
Bı dilaweri,  
em...

Seydayê delal  
Bî serê te i tacdar  
Dê ev pergâl.

hilwese

Eninîvisina şarsaniyetê wer dibêje  
Û wer dînivise di rûpela defterê  
Deftera bîr;ardana karkêran.

Wê bî geran  
Bê şikandin rêzila dilitiyê  
Vi diwarê ku  
Jî nîha ve terk lê ketriye  
Dê bê herifandin, jî bini  
Bindest wê bifilitin,  
jî nirê koletiyê

Wa

Lî dînê serapa  
Gîhiştin hev  
û yekbûn  
Karkêrên hemi peleyan

û gel û netewêñ bindest

Lî hember  
Dehak, Qarûn, Fir'ewn û Azer  
—Yêñ di heyman—  
Seraser  
Lej dîkîn.  
Xwedîyêñ dîravan  
Û Neronêñ vîrni

bî pêgavan

vedikîşin

jî qada şeri.

Lî aliki belengaz û sitembar,  
em...

Lî aliki kedxur û sitemkar,  
ew...

Jî wan re, tu me be piştevan  
Û jî «Lamekan»

dakîse,

were

Lingê xwe deyne ser axê

Bla lingê te ax bigire  
Û binihêre.  
Mina kurê Nûh, nola jîna Lût  
Ve ne qete ji hogira.  
Mela!  
Keştiya me li ser rabûnê ye  
Lî pey helaka xwe me çe  
Bîzivire.

## Jindari

Lî **kersaxâ** evîna te  
Dil, masiyek pîrpitandi.  
Bê derya evinê, kê dit  
Jindariyê, kê hêçandi?

## Bibisire

Bibisire

Evina min,

Lî eniyê nivisan

Dî dil de birina min

Bibisire.

Çi dibe,

Hema hinek bibisire.

Bo

Gul bibiskife dî bishkoja Rojê

Dilop dilop xwin binizile

lî hinarikan

Dil tawi ye,

Ketiye taya sar

Bibisire

Da ku

Tirêjên Gelavêj,

dî dil de biqijile.

Bibisire

Çi dibe hema hinek bibisire

Ü paşê

Bla tavuya çavên pijak cimani

Bî ser xal û xetên melûl de bisursire.

Ezê xwe bîdîm bîn taviya Nisanê,  
Taviya Nisanê bî bihn û adanî ye  
Ew,  
Bla li derya dili bîwîrwire.  
Paşıya tavyîyê,  
her  
keskesor e,  
Destpekâ wê, ji çavêن çimani  
Kutayî ji, bla dî dîlê b' kovani de be  
Û pê re  
Bla laşê mîn  
bişemire.  
Bîbîşire  
Evina mîn  
Lî eni nivisan  
Dî dîl de bîrina mîn  
Ez bengî me  
Jî van deveran dîçim  
rêwîngî me  
Dîl axeke bêweç e, terk bî terk e, dîpîncire.  
Gelek e, dîlovani li cem bedewa  
Çî dîbe?  
Bo serê xwe  
Hema piçek bîbîşire.

## Kuda Dıçin?

M. ŞEFİQ

Üsiv, lı ser milé çepé zıviri, lı Sléman nihért. Sléman díponiji. Ev çend rjekéf ú şénahıya xwe ya beré wında kırıbù. Zù bı zù bı kesi re ne dípeyivi. Jı hevalan dûr direviya ú bı seré xwe dicü deverna. Bı çend sieta xuya ne díkír. Üsiv dixwest hin tişta jé bı pírsé, lé réya xwe ne dídit. Jı bo ré veke, jı Sléman pírsi.

— Slémano zani ez do leqayı ki bùm?

Sléman hédika lé zıviri ú bı awirek vala, bersiva pírsa wi bı pírskeki diné da:

— Leqayı ki büyi gelo?

— Osman, Osmané Xelil.

— Lı kur te ew dit? Çı díkír? Çı dígot?

— Lı qehwé. Do piştı tu jı me veqetiyayi çüyi malé, em qaseki din ji bı kaxeza leyistin. Ew ji hat qehwé. Pír rúnenist, zù rabù çù. Pírsa te ji kír. Lé pari made kíri bù.

— Ew çíma mad ú mirûzé xwe díke? Kéf kéfa wi ye... Ew ú píreka xwe her dû ji díxebitín, rojé du yewmi distinín. Karé hésan, pembû berhevkin ma tu díbé qey pír zor e.

Desté xwe lı berika xwe gerand, çıxare derxist, yeké da Üsiv, yeké ji wi véxist. Dí ber wan de sé keçik derbasbún. Bihna ko jı wan dı fûriya dı dilé Sléman de péjna odén sor véketi rakir piya. Lı dû keçikan awirén wi yé birçi meşyan. Üsiv hat bira wi. Lé vegeviya:

— Osman qe ne be évaré tevi píreka xwe radizé. Lé em...

— Na lo. Ne jı ber van tištén hané. Jı bo kurké xwe mirûz kíri bù. Lı gor gotina wi lawık pír bé hal ketiye. Laşé wi sinciri heta sibé

dı xweydané de dîmine. Jı lawiké re çend aspirin kiri û çû. Heré li der û doré wan çadiré nas hene lé disa ji divé mirov êvarê li malaxwé be.

Osman... nexwes... zarok... dı seré Sléman de çûn û hatin. Ne xwest peyvé diréj bïke. Tené got:

— Belé.

Xweydaneki hûr dı laşé wi de avét. Bi devzendiké ko jı qiréjé demûş girtibû eniya xwe paqış kır. Çavén xwe li der û dora xwe gerand. Jı hejmara wan, ya şeveqé, pir kém ne bûbû. Sih-çıl zılam li héviya «qısmeté rojé», hın jı pıya, hın ji q!ûskdayı, li dor «Küçük Saat»é civiyayı bûn. Dı bizav û peyivandına wan de sistayı û dixwer-neditin dixuya.

Sléman ji wek hemûya bı şeveqé re rabûbû. Şorbeniskek xwaribû li cem Eli Hosta û rast berê xwe dabû gastina «Küçük Saat»é. Pir ne çû pénci-şést zılam li gastiné civiya. Dı dûre, hın jı wan li pey kardayoxa çûn kar. È mayi bı héviya ko ew ji kareki bîbinin ji seré çend sieta vir de jı gastiné dûr ne dibûn. Lé édi hın jı wan dı navbera çûn û mayiné de dudil bûn. Jı ber ko sewitandına tiréjén rojé xurtır bûbû. Weka jı wan re béje «Rabin herin, nema win iro kareki dibinîn». Karkeré ko Edené nas dikirin, dizanibûn tavçı dibeje. Wan dizanibû ko pir na çe, ev kîlora sorezer wé pétiyé dojehi li ser bajér bîbarine. Dı wé demé da ji papûr dé alav bïde. Dı navbera her dû agiran de mirov dîpije. Jı ber germa fetisoki û zeliqoki hemi jindar xwe davéjin ber siyé.

Çend kesé ko héviya xwe jı ditına kar bîrin, rabûn çûn. Üsiv bi awirén «Ma em ji ranebin?» li Sléman mîrûzé xwe tûrş kır û got:

— Ez nayém, dixwazi tu here.

Üsiv dixwest wi ji bı xwe re bîbe, lé, xuya dikir ko ewé Sléman ne çe. Üsiv xatîr xwest, çû.

Sléman dı ber xwe re «Ev roja sisiyane ko jı beriké dixwim. Çewa ezé herim?... Ewé iro vala ne bîhure. Niqutiye dîlé min.»

Beré xwe da wi aliyé papûré. Çavén xwe li nav lehiya çûnehaté gerand. Cı dibû yek jı nava vé lehiyé bı hata ber, û jé re bı gotina «Ez xani lédikim. Jı min re betonréj divé. Ne karé rojeki û du roja ne. Yewmi ji baş e.» Na... Na... kes bı ali wi de ne dihat... Çavén wi bı keçikeki ket. Pantoreki wîsa teng li xwe kiribû ko, yén dı bîhurin disa dîzivirin û lé dînihértin. Sléman dı ber xwe re çéreki pîr nuqte kır... Jı nû ve çavén xwe gerand. Hæ... eré eré... Zilamak beré xwe dabû aliyé wan. Dixwest derbasi vi aliyé papûré bîbe. Lé jı çûnehata wesaitan ré ne dîdit. Li wan dînihért. Belé belé li Sléman dînihért.

Sléman zanibû, nıqutî bû dîlé wi. İro vala ne dîçû. Belki sibé ji, dusiba ji, sésiba ji... çîma ne be?

Zîlam dagirti û por sekirî bû. Awirén Sléman wi hişk qefaltibû. Wesait kém bûn, zîlam lî rast û çepé xwe nihért, bî gavén lezandi derbasi vi aliyé papûré bû. Gîhişt vi ali, demek sekini, awirén xwe lî ser komé gerand. Sléman hebûna xwe dî çavén xwe da civandi lî çavén zîlam dîgeri. Hévi bû çûk, çûkek lî ber firiné, hat lî ser dîlé Sléman dani. Jî ser dîlé wi fîriya hat lî bibikén çavén wi dani, bû du nuqté ronahi wer sekini. Qefalt, çavén Sléman awirén wi zîlamî qefalt. Zîlam lé dinihért. Zîlam ber pé meşîya. Sléman zûq ma bû, awirén xwe jî zîlam ve ne dîqetand. Zîlam hat, hat lî beré sekini.:

— Niçin bana öyle bakıyorsunuz? (1)

Siéman lî hev şaş bû.

— Ben... ben... size baxmîyor. (2)

Zîlam lî xwe ne gîrt zéde pé re bî peyîve. Bî awirén térr û xwe binayı lî komé nihért, meşîya çû.

Sléman hay jî xwe ne ma, bé hemd çér jî devé wi vala bûn.:

— Min dî .....

Çixareki véxist. Jî şerma qet lî komé ne nihért, meşîya çû.

Dî ber deré sinemaki de dîbihuri. Desté xwe lî berika xwe gerand, lî keçikén ser kaxez yén ipela tazi û dîkenin, nihért.

Bilét stend, ket hundiré sinemayé.

## D A W İ

(1) — Çîma wer li min dinéri?

(2) — Ez... ez... li te na nére.

DERGÜŞ

D. YAVUZ



## Çirok

Car Zane,  
Zêr Zane,  
Zor Zane...

**FERİDÜN SALAR**

Roja şemiyê, şemiyek ji şemiyên Gelavêj bû. Roj zû da lî ser milê roavayı qelibibû, lê disa hêji helekeleki germixoki û fetisoki bî tundi hebû. Ne ji aliki ve sîreki dihat, ne ji pelekî lî daran dilipiji. Herweki dîrneyek lî hevana dojehê ketîbe û helekela wê ya hêtûni, mina mozikê mozkiri ku kertikê xwe qetandîbe wisa lî dinê belav dîbû. Ji nivroyêñ bajêr, dûyeki gîran yê ka û xîşolê hildîkîşî, têvi bêhna xwe i pis lî ser bajêr dikumîşı. İro şemi bû, roja dadana kûra qewaqa...

Qamyoneki bargiran dî kolana mezîn da, misêwa bî qlakson lêxistîni, xubar û gemara kolanê lî pey xwe bî bakırını derbas bû. Barhîlgirêñ piştî û yêñ navgindar, bî lez u bez dan dû qamyonê. Qamyon, lî ber dîkanêñ zérzewatfrosêñ mezîn rawesti. Ji barhîlgiran, zarokan, esnafan lehiyek ji sê ali ve ber bî qamyonê herîki. Boşahiki bî geremoli lî dorê hêwiri.

Hemê Teyo dîqiri: «Wernê... wernê... erzani ye, ne din e, ne iman e balican bî bistî, erzan e, erzan e...» Hemê Teyo tiredineki bajarê me ye. Gotîneki pêşîyan he ye: «Her gundeki xwedi dineki, qehpîkeki û seki dijwar e». Tiredinê me i navdar ji Hemê Teyo ye.

Rojnamefros bang dîda: «Haydê rojnamê rojê... haydê rojnamê rojê... nûçeyêñ teze û nû... haydê rojnamê rojê...»

Ji paplûkêñ derenca pêwara memûran, Qeymeqam bî gîrani, bî awîrêñ niv ferma û niv beserûki hildîkîşî. Saqoyê xwe i lî hev

nûrandi avêtibû ser zendê xwe i çepê. Mîlên qutikê xwe i spi pêça bû heta enişdan û vegirtinê. Di aliki de ji çavê xwe lî ser masa, li nasan digerand. Wi kesen nastir ne ditibe ku hindava meşa xwe ber bî masa min ve zivart. Bi fesala çend pêgavan nêzikê min bû, bi beşeruki:

— Rojbaş berêz Baran!

Ez rabûm pê bo Pêrgina wi.

— Rojbaş Qeymeqamê me.

Min taflîlê sandalyeki ji ber masê kışand, Û lê zivirim:

— Fermo, em rûnên.

Qeymeqam beg dudili bû. Dixwest rûnê lewra ji min nasturinti-reke wi li wan deran tu ne bû, ne dixwest rûnê lewra têkiliyêne me di tengasiya fermayıyê de kurt, teng û qels bûn.

Sandalyeki di kışand, saqoyê xwe i nûrandi bî endaze dani ser paldanka wê, li a ku min kışandibû nihêrt, qinyata xwe bî paqîjiya wi anî, rûnişt.

— È... çawan i berêz Baran?

— Spas efendim. Hun çawa nin?

— Spas... oooof ev çi germek bêhnfetisoki ye? Qet nayê kışandin.

— Belê germeki gelek pis e.

— Min gava dî, beri bêm vê ava sar ji li xwe kîr disa ji bereday e.

Çawa ji avê derketim taflîlê wacek li min çêbû, xwêdanê di min de avêt.

Serçayger hat, nêziki me bû. Bi rawestaneki lejkeri çıkışya. Bi serheji pırsi:

— Fermo... we fermanek he ye efendim?

Me çay xwest. Serçayger du xwelidankê paqîj anî dani ser masa me bî endaze vekisi çû.

Hê nû hatibû. Hefta wi hê nû qediyabû, heşt meh berê. Gerin; endeyê min, li min bû moz û bî min ve zalîqi:

— Haydê em herin bixêrhatınıya Qeymeqam beg.

Min kîr ne kîr bela xwe jê ve ne kîr. Bi zorê min wi du sê roj xapand, lê disa wi ez bî zor bîrim bixêrhatınıya Qeymeqam begê.

Dîbe ku ne kurmek pak be, an ji kûviti be, lê çawa bikim ne di destê min da ye. Tu car na çim bixêr hatınıya gerinende û hêvotyaran. Çawa be em dê rojeki hevûdü binasın ji xwe. È di zêrzewatêne zêde ne. «Çawan i efendim? Spas... Tu çawan i? spas...» Gişt pırs û bersivêne ne ji dil, yêñ ji qırıkê berjor...

Em cùn. Me bixérhatini tê da, rûniştin. Dî çarçifa fermageri de em qasek mijûl bûn. Hînek tiştên karbîdestiya gerinendetîya me pîrsi. Ditinêñ xwe i arizi yê derxîsûsa karbîdestiya me diyar kîr. Bî kurtayı ditinêñ xwe i sıvakhêvoji vekir, gote me:

— «Serûber büyîna cîvakeki, bî pêkanina qanûnan li ser reyâ durustiyê ye. Dîvî em gişt, ci hêvotyar ci hêvotvan bî durusti, bî pêrerastbüyîna qanûnan, qanûna bîmeşinin. Şela xwe, tevgera xwe dî nav çarçifa wê de bîdin hev. Efendüm ku her kes dî tengä, dî hindava xwe de bîxebîte, wê welaîê me ji bigihije gihanekâ peleyên pêşveçûyîntirin, yên mezin. Ew peleyên ku peleyên ji xwe qelstir dâdbilinîn. Sermayedar dî tengä xwe, xebatkar dî tengä xwe, se anser her kes dî hindava xwe de ji bo vi welati bîxebîte, karkêr karkêriya xwe bizanibe qînyata xwe bî romîziya xwe, sermayedar ji sermayedariya xwe bizanibe qînyata xwe bî kara xwe bine, milkdar bî milkdari, gundi bî gunditiya xwe qînyata xwe binin û ku ji bo bilind û gewre kîrina welêt bîxebitîn, wê çaxê wê welat ji şerpeze bûyinê bifilite. Vatîniya me, wezifa me ev e. Bo pêkaninê tiştîk bî tenê pêwîst e; mengiwer bûyin. Ji me re mîrovêñ, hêvotyarêñ, karbîdestêñ mengiwer dîvî. Dewlet dî ser her tiştî de ye. Em li vê derê neminen-detîya dewletê dîkîn. Çawa dewlet dî raserê her tiştî de cih distine, welê ji em hêvotyar pêwîst e ku rasertirê damezranêñ siyasi bin. Dîvî beri her tiştî baweriya me bî xurtbûyîna me bê... «Em Kemalist in, dîvî dî bin ronahîya bîngehêñ vê riyê, em rî bisopinîn.»

Besta Qeymeqamê me i nû, berêz Fuad Ûçar lê vebûbû. Mina her hêvotyarêñ parêzgahi an yê navçeyi dîxwest ditinêñ xwe i arizi bî niv-şireti û bî niv-fermani ragîhine yên berdestê xwe ku ew ji li awayê wi serevabîn. Hêvotyarêñ naverasti yê dengbarivan ditinêñ xwe i derxîsûsa şopandîna kari, bî namedoran radîhinin pajên xwe. Serêşandîniyêñ wan hebin ji dî rûpelêñ namedoran de dîminin. Merîv dikare ne xweyne.

Me jê xatîr xwest, em rabün, ew ji rabû heta ber deri em verê kîrin, em hatîn.

Çend meh tê de bîhuri. Rojek disa li pêwargehê rûniştibûm, gerinendê xwendengeha pêşin Eli beg hat. Kek Eli. Lî her navçeyi, parêzgehêن piçûk ji vi Eli begê, her yek he ye. Bî gelê ciwari re bî zmanek qube û ferma diaxifîn, xwe ji eşrefa dijmîrin. Ji ali familyê ve ne axa ne, ne şêx in, ne karkêr û gundi ne, lê rehêñ wan i cîvaki dî aliyê jîn dîn û stendinê de dî nav van gitstan de belav bûye mina



dafîka piravtonkê. Dî nav qora feodalan û dî nav qorêن gelêri yê dî de ketîne hesarê, hatîne gîvaştin. Gelî, wan bî bernavka efendi bînavdikin. Herweki Cîndî efendiyê Piro, Sofî Ahmet efendiyê Kalo, Bayram efendi, Aydîn efendi, Dawîdê Gulşê efendi... Efenditiya wan ne jî ber xwenda büyîna wan e, Lewra nîvisana wan pîran drûvdayiyê rîça qîjîkê a li ser berfê ye. Hetani çend sal berê ji, heta pênuşê dî zmanê xwe ne dana, bî zmanê xwe şîl ne kîrîna ne zanibûn bînivisin. Jî vana re eşraf dîbêjin. Bî gelemperi bermayê çandemendarên trîki, yê dema şarederi kîrîna Kurda ne. Rebena ne bûn Tîrk, Kurd büyin ji li wan qar hat.

Eli begê ji, bî malbatî endamek ji endamên vê qora cîvaki ye ku hat danasin. Begitiya wi jî ber mamostayıya wi tê, ne jî torınıya feodali. Lî em jê re na bêjîn Eli beg. Bî rasti em jê ne wêrin. Divê ku em bêjnê Eli abê. Kek cli an Kekê Eli ji na be, jî sergiranîya ferma re dest na de. Pêwîst e her bêjnê Eli abê.

Eli abê nefş tenik in li ber keç û pirekan. Nê jî hêzkariya wan i zayendetî, lê jî ber bajarvaniya bilind pirani bî sekse bili ne. Eli abê bîyanîhîz in; ne jî ber mîrovhiziyê, jî ber dûrketina jî gel û cîvaka xwe û bî wan dan baweri kîrîna şarsaniyet büyîna xwe. Gelê wan hê dema hovitîyê dijin, lê ew bî xwe xwenda ne, çandemend in, şarsaniyetmend in. Lî cem bîyanîya tevgera wan zîrav e, bî kawdari ye. Lî weki dî, aango li dervayî cîvata bîyanîyan qure ne, rageş in, mîrûskiri ne. Eli abê ne bihize lê tirediniya wan gelek e.

Eli begê:

— Merhaba berez Baran. Çi dîki?

— Rojbaş... fermo! Rûnani?

— Min çavê xwe li hevala gerand, wa hê kes tu nine li piyasê. Qasek li cem te rûnêm.

— Xêr be, heval ki ne?

— Heval?... hûmum... Ewk in lo. Hevalêñ listikvan. Ên qonkenê. Iro gelek westim. Birader ka çawa tê ne westi ku... Az carna dîbêjime we belbi hun li ba xwe dîbêjin «Eli abê neyarê xelqê xwe ye, an ji dijşoreşgér e». Birader ên me na bin meriv. Oxlîm lawo hun çî dixwazîn? Hun li navçeya xwe mamostayı dîkin, dewlet mehmiziya we dîde, jî bili berpîrsiyariya xwe ma ku hun di karê xwendegêhê, dî yê dî de ji bixebeitin jî na be. Wê kevir bibare. Na bin meriv, na bin meriv. Binêre vi Qeymeqamê me çî meriveki baş e. Vê navçeya me heta iro qeymeqameki wişa ne ditiye û jî nîha pê ve ji dê ne bine. Jêhati, jêhati. Mengiwer, mengiwer. Komarperwer, komarperwer. Ne hîstün eefndim ne hîstün...

— Kijani? Kijan qeymeqam?

— Canım kijan he ye? Fuad Úçar beg.  
— Çı bîye jê?  
— Çawa çibîye jê, ma te ne bîhistiyê?  
— Na... min jê hay nine.  
— Rast e, tê ji ku bîbihizi. Mihemed axa li serê dîgere bo ji vê derê rakin.  
— Çima?  
— Meseleki dûr û drêj e. Viya heft meh berê hat vê, dest bi kar kîr. Dî pîst hatina wi de, Mihemed axa dîçe bîxérhatınıya wi. Xwe pê dide nas kîrin ku serek navce ya parti dadnasi ye. Darazdar Çetin begji bi axatrya wi, wi dide nasîn. Tabi qeymeqam ew qas rû na dê. Tê de meh ki dîbuhire na bîhure, bi xulamê Mihemed axa re demançe tê girtin. Mihemed axa telefonê amîrê ewlekariyê dîke, amîr dîbêjê: «Axa tu li min me gri, we'zhi ji tîrsa qeymeqam ne wêrim. Ne ji Fuad beg biwa min dê berda. Mihemed axa ica telefonê qeymeqam dîke bo berdana xulamê xwe, Fuad beg li ırzê wi dîkeve, wi dîhetikîne. Tabi xulamê wi çend roj raza paşiyê dî dadgeha aştiyê de bi cezaki hindik jê filiti. Ew çû. Dî çaxê zîbla kimyewi danê de qeymeqam dest dani ser belavekîrinê, ji devê guh ne da Mihemed axa. Mihemed axa sondê lê xwar. Mirza vê bîravê min dîgot Ew li rawestingeha axê bîye, Mihemed axa telefoni Serekdengbar kîriye. Pişti pîrsa hev ji dî kîrine, gotiyê: «Kaka berêz Dengbarê Navxwekari çı dîke? Lî kî derê yeki sor i bêkêr, dijmînê gelî, qomonist he be ji me re dîşine. Mîrik weki ne qeymeqam be, peyayê qomonist û vejetandingêran be berberiya me dîke. Îsal kesi ne zîblê stend, ne qrêdiya çandını... Hee... navê wi? Hîn hîn navê wi Fuad Úçar e, Fuad Sîçar e...? Fuad Úçar. Kaka wellahi ên mo şewtin, qeliyan. Bo nûçe stendinê kengê li we bîgerim? Mehki şûn da? Na kaka pîr dereng e. Mîlet qeliya dibêjîme te..» Te got erê?

— Belê guhdarıya te dîkum Eli beg.  
— Hefteki şûnda, Dengbariya Navxwekari gazi Fuad beg dîke. Fuad beg çû, panzde bist roj li serbajêr ma. Jê re dîbêjin: «Jî xwe re cih ki dînê bîbjêre an ji lingê xwe bi endaze bavêje..»

— È paşî?  
— İro du sê roj e, wa zîviri hat. Tîrkîtîrka dilê wi ye. Ku wi bîdîn dereki dî, sicila wi ji dê xera bîbe. Lî te diye kes dengê xwe na ke, na bêje ku Mihemed axa lawo ka tu çı ji camêri dixwazi...



Serçayger li ser tepsiyeq paqîj, ji paqîjîyê çîris bî çîris çayêن me ani, mina gava dî, bî giramgiri û bî endaze pêşiyê a Qeymeqam beg

dû re a mîn dani ber me. Lî ser têpsiyê du pîyanê av dagirti hebûn.  
Bî gîramgiri pîrsi:

— We av dîva efendim?

Me av ne va. Serçayger bî gîramgiri xwar bû, vekişi, çû. Me  
şekirê xwe avêt çayê, lî hev xist. Mîn jî Qeymeqam beg pîrsi:

— Nûçeki dîgere dî bajêr de; dîbêjin ku te ji vê radikin. Rast e  
gelo?

— Ka em binêrin. Nîyetekî mîn i wîsa he ye lê hê mîn tam  
bîryar ne daye.

— Xêr be? Hê heşt mehê we ne qedîya. Jî ber sedemên sîyasi an  
en arizi?

— Na canim. Tu sedemên sîyasi tu ne. Ez qeymeqam im; bî  
akamên hêmanên sîyasi kes nî kare mîn jî cihê mîn hilîne. Me nîhêre  
mamosta û memûrê dî, bî hêmanên sîyasi jî cihê xwe têr rakîrin,  
lê e me ne wîsa ne. Em neminedeyê Dewletê ne. Em hem neminende-  
tiya Serekkomar, hem ji a kırdayetiyê dîkîn Kijan hêz dîkare me jî  
bo daxwazê xwe i sîyasi rake. (Bîşiri) Ma ne wîsa ye berêz Baran?

— Wele dî hoyêن iroyi de her tişt dîbin. Têr hisê meriv.

— Na canim na berêz Baran na canim. Ên mîn, hînek hoyêن  
mîn i arizi, yêñ malbatî he ne. Ew ji hê bîryareki dayi lî navrastê tu  
ne. Tenê dî warê ramandinê de he ye. Ka bînîhêrin. Qeder, qîsmet...

Rûdwan, nîvisvanê dadgehiyê hat, nêziki masê bû, destêن xwe  
dî ber xwe de berda, bî nîvxwarbûyini gote Qeymeqam:

— Qeymeqam beg, Çetin beg û yêñ dinê lî hêviya te ne.

— Yaaa lî ku derê ne?

— Lî hewşa ewlekariyê ne efendim.

Qeymeqam beg rabû, rahişt saqoyê xwe i nûrandi ya lî ser san-  
dalya a kêleka xwe. Ez ji pê re, bo verêkirinê rabûm.

Qeymeqam beg:

— Bi xatirê te. Bo her tiştî spas berêz Baran.

— Tika dikim berêz Qeymeqamê me.

Qeymeqam beg lî pêsi, nîvisvan Rûdwan lî pey vejetîyan, çûn,  
jî derencê pêwargehê dakîşin.

Hewa hê ji germixoki bû.

Dotûra rojê, mîn Ferzendeyê Bîşar, şaneyê Mihemed axa dit.  
Dîcûm malê, wi ez lî ber dîqana Selimê Silo giirtim:

— Malava tu qet xwe lî meriv danayni. Ma dostani wîsanne?

— Éra xêr be? Ev ci karozi ne?

- Bise emê hêdi hêdi keysa we bîdîn we Mê keysê li we anîye.
- Bînê zmanê te şîl e. Te disa çî bîhistîye?
- Merîvê we duh hat koşkê.
- Merîvê me kî ye?
- Qeymeqamê we i dîj-axa, ew ji hevalê we bû ya.
- È... xêr bû, ew û ki bûn?
- Ew, Çetin beg û hînek zêrzewatê dî.
- Hatibû çî?
- Hatibû şefaat xwestinê. Xwe avêt Apo, hêvi û dexalet jê kîr.
- Apo kî ye?

— Mihemed axa lo... Em jê re dîbêjin apo. De bise ji te re bêjîm. Apo li vê derê kîr ne kîr, efendiyê we ne hat rayê. Telefonî Serek-dengbâr kîr, çendeki dî pey re Dengbarî gazi kîrê, ber wi wali li jîrzê wi ket, efendi seri danani. Piştî ku çû serbajêr, nîhêrt ku henek menek ni ne, wê malê li piştê kîn, berê wi bî aliki dîn de kîn. Heta Dengbar telefonî apo kîr, gotê «va bîryarnama wi hazır e, ew bî xwe tê ku we lihev kîr ji xwe lihev kîr, na ku disa serkâşiyê bîke, tu telefonî mîn ke, tafile bîryarnama wi bîşinim imzayê». Te got erê.

— È...

— È û è... Duhi hatin dîgel Çetin beg, wan. Xwe avêt Apo. Rîyê xwe dî erdê da. A ku dî ber rîyê de ani got ku Xwedê ne gravi dibin akama hînek gotinên ku hînan jê re kîrine maye. Ji niha pê de van kil û kîmasiyêñ ha de cari ne bin. Hêvotyari tişteke gelek hêsan ni ne, dîgel zorbûyîna xwe ve hînek kîmasi, xeleti jê çê dibin. Bla axa van kil û kîmasiya bîde bin lingê xwe. Ji xwe ew ji bo xîzmeta mîletê hatîye, gelo ji mîletê û serwerêni wi yê serbijare re xîzmetê ne ke, dê ji ki re bîke. Te got erê kîriva. Weşek bî kîfa te rûniştin, li ser daxwazîya Çetin beg rabûn tev de çûn parêzgahê.

— Tu ji çûy?

— Ez ji çûm lê çawa. Em çûn Atlanta Palasê. Pêşiyê bî dîlê mîn û te me xwar û vexwar. Paşiyê tev de em dakîşin pawyonê. Berdestî spêdê em zîvîrin.

Qlaksonêk tûj dî bin guhê mîn de lêxist. Lî zîvîrim, ciranê mîn i Yekta bû. Yekta:

— Nayî malê ciran?

Braziyê Apê xwe dibisiri:

— Car zane, zêr zane, zor zane...

Derbasi rex Yekta bûm, teqsi birêxist. Mîn kaseteki li tepyê xîst. Isa Berwari distra:

— «Esmerê dîgot lawîko, bê sozo, bê qewlo, bê qeraro!...»

## DUMAHIK

## **Helbestêن Mem RONGA:**

### **Bîhar Pêşiyê Tê Li Helbesten**

«Şeveki jî nivé şevé pé da»  
-Çîma ne bî roj?-  
Bibim méhvané te  
Herim cîvinan  
Bî dileki keri keri  
Derbas bibim dî ser mayinan  
Zéde bûn pîrsén mîn  
Wan zirtan zéde kîr  
Çekan zéde...  
Zéde bûn em dî girtigehan de  
Zurtîr bû dîberxwedan  
Jî derdén giran  
Me evinek mestir honand  
                    bî sibé ra lî hev kîri  
Bîhar pêşiyé té li helbestan  
Bîrinén mîn gul vekiri  
Jî kargehan  
Stiranek olan dide bilindahiya  
Stiranek/jî yek dev  
«Jî bo wan her tişt qedîya  
Jî bo me nû dest pé dîke»  
Zîké şevé li ber dev...

# Deriname

Deri

Deri

Deri

vîr da dinérím deri

wîr da dinérím deri

deri kîrine her deri

deri hene dar -ji daré kevot-

deri hene hesin -wek ûr û tûrsén é pišt mezin-

deri hene deri

wek deriyé koxa

-li pišt wan

her yek li ser çar dariké bî és û jan

panzde seri

deri hene deri

li pey hev bî notırvan

him bî bertilé vedibin

him bî firtiné

deri hene vedibin berdesti sibé

bî singuya

deri hene vebûna wan

bî satılcan, jana zirav

bî xéra

mîrina

zaruya

vîr da deri

wîr da deri

deverek ne ma vekiri

afrandin kilitek mezin û zingari

him ji qelen him ji esalet -werdekiya nav murişka-

avétin ser deré dilan

radan

deri

deri

deri

na be

wîha na çe seri

## Jî NAZIM Du Helbest:

### Ayê

Ayê kî herri dî hînda miclewri  
aw dî hînda masi,  
hewa ra hînda milçikan zafê;  
teres,  
bêtters,  
nezan,  
zanaye  
û gede yê.

Ow ayê kî mîrînenê  
him zi virazenê ê yê.  
«Destan»ê ma dîr mesele y inan tenya estê.  
Ê yê kî pey bî dîşmeni xapênê  
û dîşmeni raşte dî verdanê  
vazdenê keyandê xwi.  
Û ayê kî yew bêdini erzenê xenceran fek  
Û aye kî zey yew dara kihoy hîwenê  
Û xwi vero bermenê  
Û nengan çinenê bî mar û piri,  
«Destan»ê ma dîr mesele y inan tenya estê.

Asın,

komır

û çol

û oqyanoso hewz

Û siudê rayiranê royanê derdênan

Herra ramita û şaristanan

Yew nîmacê cûserra bedelêno.

Yew nîmacê cûserra kişta tari ra,

Key kî inan destê xwînê gîrani herri şanay

xwî rast kerd.

Ayê kî rismanê en weşan lîlîkanê en rîndan sero

vîrazenê ê yê.

Seserra ma dî inan zor da, zorê inan şî.

Zaf çiy vajey inan sero

Ow ina nrê vajîye kî:

«Rêzilanê ina nvişêr tebayê vin kerdişê inan çînnîko.»

Tadayox: Malmisanîj

## Strenêñ Me

Stranêñ me

dîvê li berbajarka derkevin kolana.

Stranêñ me

dîvê, li ber malêñ me rawestî n

û li cama xin

bigrin bi destêñ deriyan

bîgvêşin

heta ku tahl kim

heta

ku deri milêñ xwe i grêdayi vekin.

Em fêm nakin

jî strana jî deveki bitenê.

Her şeva şinê

her roja cejnê,

stranêñ me

bi li xwarê xistina sindoqa don

û bi derketina serê

dîvê, bi lepêñ xwe i qrase çepik bi kutin.

Stranêñ me

mina bayek jî daristanêñ kajan

dîvê, xwe tev jî yek devek bi me bîdin strandin.

Stranêñ me

dîvê li qora pêsi, li pêştir raperikin dijmîn.

Dîvê beri me bê gonandin

rûyê stranêñ me bi xwinê.

stranêñ me

dîvê li berbajarka derkevin kolana.

stranêñ me

nîkarin rûnêñ di mala deri radayi

perde daxisti

ya dilek bitenê!

stranêñ me

dîvê derkevin bayê.

# Çirok

## Estaneka Mêşna

Niwîştox: Sabahattin ALİ

Wextê dî yew darîstano daroberêno herr û heray ver dî yew mergî dî yew pes bi. Pesi sero zi, bi kutikanê xwî, şıwaney inan bi.

Vaşê mergî timo zaf û teze, awa çemiya kî verra vêrena zi zaf û pak bi; asaneyî mêsnan cadî bi, çimka kî amnani ca o kî tedi'r tay darê gîrri kî ê binê inan dî rakuwi ow zîmîstanî ziyew mexera kî serdi ver ê şinê miyan dîr bi manê biy.

Labrê ancina zi keyfê mêsnan ca dî nêbi. Înan gerre y şıwani kerdni. Müy sîpi dekewt biy erişa ni şıwani ow yu nîmac ra heya şan hiran ra rakewtni, ge ge zi yew cif lûliya xwî cenayni, kutikan ro berrezîyayni, rayna xwî dî şiyini. Mêşney dutini, heyena kî şinayni şit werdni, ayo kî nêsiya bîwero rotini; gama kî zerra ey waşt, yew kavir sere bîrnayni, pewtni, nê zi yew mêsna sere bîrnayni, zîmîstanî ri goştî vîraştini; dî hîrî hewtan miyan dî celeb kî ame mêsney û kavîrê en qelewi dayni cî, peyni dî rayna rakewtni, xwî dî şiyini. Wa ni pêro ayca bîmanê, mêsnan semedo kî zanaynê kam mêsna ey dest kuwo, peyeni quesabi resena, kam gama kî no mîrdeko goniwer bîhasayni ê recefiyaynê, xwî têbîna kerdnê vero ameyîş bîra inan vir nê kewtnê. Sekerê? Sazumanê na dina enawa bi.

La enê mêsnan miyan dî enê karan ra çiyeki hêstê tayini nê kewtni, tayı zi biy tersdê yew ro; dekewtuşê binê kardi reyra ganî mendîş ra w se, waştîna mesela bîncaran safi bîkerê. Roj bi roj enê vişi biyni. Ma vajim kî: gama kî kê vatni qey çûkî pes esto xwî ri

çereno, nişka miyan ra yew berano kelebiyaye perrayni qineste y şıwani qoçi kerdni. Şıwane sew adê bifetelno, pey bî kutikan ey bîtebişo, bigiro yew dari ra pêt bîbesto ow tujaro verên kî ame bido cî zi, çimê ay binan hewna nê tersayni. İnanê kî vatinê: «Senê bîbo peyni kî sonê qesabi dest, ewro zi bîbo meşti zi bîbo yew o!» ow qoçê wxî weşanaynê, roj bî roj vişi biyinê.

Mêşna me vajê me vînderê. Miyanê inan dî zi, çi berani ci camérdeki estê. Verniya dina ra mêsney heme, şıwani û kutiki reydi nêbi kî! È zi yew wext qesab û celeb, şıwane û kutiki ra bê hagi bi; xwî ser geyraynê, werê xwî peyda kerdnê, dışmenê xwî qoçi kerdnê fetelnaynê.

Labrê inakê kî çim ver goştê mêsna da, inanê kî şitê mêsnan ra ruwen û penir, çerme y yeni ra kurk û çarox vîraştê, verê verkan mêsney day bawer biyayış kî, eksow bê şıwane bîmanê veşaney ver gêsti mriyenê. Enawa ra mêsney zi xwî ra bawer nêbiy, héviya inan gewetê xwî ra nê mendî. Va qey şıwane qandê goştê inanê nemri ra nê, qandê çimanê inanê siyayan ra inan cenaweri ra paweno, yew qevda vaşı erzeno ver.

Ey heze kî ma va, hêdi hêdi hêşê mêsnan ame sere. Şıwane y zi roj bî roj xîrab biy bi. No peyen bîra rînd qesmer bi. Keyfê xwîno asaneyâ xwî vişêr teba nê ardni xwî vir. Gani deme w kî cenaveran ramitnê pesi ser, heway şıwananê verênan çiwa xwî bî girewtî, kutiki xwî dîma rêz bikerdî, bîşini vera. La ey -wini nê kerdnîçend hebi mêsney, kaviri eyştî, xwî ser deh kerdnê.

Rojan ra yew roj heybanê kûyi û cenawerê kî daristanê nîzdi dî, kewti tê miyan. Semedo kızımıştan aya serrî xîdar bîbi, vergi û heşî kî bê wayir mend bi kelebiyay bi. Vengê lawayış û qirriya inan ver kî hetani merga pesi ameyni, mêsney û şıwane piya tîr tîr recefiyaynê. Yew fesle, çend vergê kî leca daristanî dî bîrindar biy bi, remay bi, nê zi gêsti zaf satiyay bi û nê dekewti bi leci, xwî eyşt bi kişa daristanî. Senê mêsneyê tersi ver şaşbiyayey diy va: «Embazêne dışmen hîni yo!» ow rikêf kerd ser. Labrê mêsnan demewo kî fekê vergano akerdewo sur û dîndanê inanê girdi diy, fahm kerd kî mesela henekî niya. Kutiki zi semedo kî meşhey inan dest ra şerê veşan manenê, bî no fikir xiret kerd, hemini piya ramit enê verganê şeteye kan ser. Beranan serey xwî na bî xwî ver, bî qoçanê xwinê xişnan, ramitnî cenaweran ser, kutiki zi gellek laway, hermele kerd. Vergê veysanê kî xwîra gêsti bê zîdi mend bi ow zorkani lingan sero vindartnê, tira çend teney cadi apey vazdey daristan, ay bini zi merde erra kewtê.

No hîng dî şıwanewo kî cay nimîtişê xwî ra veciya, bî weşanayışê çiwa ba xwî, waşt kîfîna bêro pesi ser, ay çaxan mêsnan hêşê xwî ant

pêser. Qesab û celeb ardê xwî vira. Kutikan zi qırar da kî wextê çıwa da cî ra xellesiyayışi û mêtinan reyra tena mendisi yo. Hemini piya ramit şıwani ser. Şıwanewo weqefiyaye rema ganê xwî zor xellesna, gilangina zi ay beyntaran dî nê hasa.

Hina vişi eno lec dî karê kutikan bî. Heta yew ra mîrdalê verganê kî mergî de, hetê bin ra: dades mêtinanê kî lec dî merd bi wardi bi, rînd mîrd biy bi.

Dest pey kerd keyfi reydi boça xwî têşanay, ziwanê xwinê surî reyra xwî lişt, ay beyntaran dî geyray û va: «Şima diy kî; ma, şima vergan ra zi, şıwani ra zi xelesnay!» bî enawa mêtinan sero paye kerd. Verra zeman kî viyart, pîrnika inan hina berz biy, me vajî kî kutîkeya kutikan tersdê şıwanan ver bi, senê kî bê şıwane mendi inan ra bêter biy. Çendeki lawaynê, vengê inan weşbê xwî şîynê, vatinê: «Vengo kî pey mêtney şîdiyay, pey vergi tersay û remay no yo!», çîqqas kî tedir biy vengê xwî pil hesebnaynê. Vatinê qey çend teney vergê bîrindari û lengayey ma bî lawayış remnay, Qandê na ra vatînê qey, ma ay kutikanê binan ra niyê. Vatinê: «Kutik çî vatîş o? Qey eslê ma zi verg niyo?» Ow weseñiyaynê.

Verra no fîkîr dekewt hêstê piyorini. Dest pey kerd, cor ra mêtinan ra owniyay. Semedo kî tamîjiyay bi, semedo kî goştê inan xwî vir nê kerdnê, kişt û kınarı dî kavîro kî tebistnê cêdi antinê, parce kerdinê wardinê, heyena kî mêtney kî tîkê pesi ra aqîtiyazynê ramit inan zi ser. Vatinê: «Senê beno kî camérdekê sey mayê kî kahikanê inan darîstan dî hukim kerdo, sistki sistki pawiteyoxeya mêtinan bîkerê?» Ow werrek ardnê, waştinê kî fina darîstananê wehşîyan dî bîgeyrê-hezey verêni-hukim bîkerê.

Xwî çim dî çîqqas kî pil biyñê, ehendna zi mêtney hîna werdi diyni. È, ay mexluqê kî goştê inan werêno, şîtê inan doşêno, aynan vişêr çiyna nê bi.

Vatinê: «Ma sowki nê lawim, paşti nêdim bîder, enê verradayey nişyêni qoçanê xwî zi bî şuxilni. Darîstano xîşino kî ma ver dî, tedir heyana kî enê çeqqalê nêbiyayey hukim kenê, enê beyntaran recef-nenê, na mergî dî hezey kaviri vindartışê ma şerm o, zaf şerm...»

Kutikan ra xellesiyayış, hînda şıwani ra xellesiyayışi asan nê bî. Enê him vêsi bi, him zi dîndanê inan têj bi. Bêxeyja aya zi yew lec kî bî, a fesali dî penc-şeş mêtney cêdi antnê, céra kerdnê. Coka mêtinan ebi meraq pawîtnê, vatinê: «La peyenî şe beno?» Ü çimê inan nê bîrkaynê kî senê şıwane fetelna, enê kutikan zi deh bîkerê. Labrê kutikan peyni dî serey xwî zi, ey mêtinan zi ward. Yew roj hîna vişi diyax nê kerd, qırar da kî darîstani zeft bîkerê Semedo kî zanayni xwî ser nişyênê ni kari bîkerê, mêtney zi xwî ver şanay, va:

— «Şima pey bî qoçarê xwî rayırı akerê, ê ki şima ver kewtê şima inan tê fek finenê, ma zi dormarey şima di berriziyênim, ma cesaret danim şima ú dişmenan tersnenim!» Aynanê ki va «peyniya ma roşn niya», kutikan tura va: «Alçax, teres, sistek, xayin! Kutikê ki heway ma goniya verganê cusıngın tede ya, bira ti nê erjeni ki reydi wardi roş!» Ow parça kerdi zerba xwî wardi.

La vergan, hesan, parsan hetana ki keftaran û çeqalanê ki hima kişa daristani di lemekan miyan dî yew gamı di pes perişan kerd. Vengê lawayışê kutikan hima titikê daran nê resa bi fetesiya, goniya mîşnana germinî, lezi palaxa ardi miyan dîr vindî biy.

Çeher panc hebi mîşney nîweşi nê zi ay piri ki nê dekewt biy lec û gelek kavirê tezey, mixara ki kişa mergî da aya miyan dî, xwî yewbina bina kerd bî. Qijjiya ki daristan ra ameyni, qalayışê ki qeseba kê veşnenê, lawayışê bê hévi esnawitnê, tersi ver recefiyaynê. Vengi ki bîriyay yewbinaran ownırayay, inan fahm kerd ki, kutikê ki şiyibi daristani bigirê ow mîşney ki bê hemdê inan, xwî reydi berd biy çi sere dî amewo. İnan miyan ra dî beranê piri gûran gûran ver bi berê mexara şiy, senê ki dî teney kutikanê ki wuca dî inan pawenê ver resay, ca dî qoçê xwinê ki hima qewetê xwî piyor vind nê kerd bî pizzedê ay kelpano-ki nika ha matmeñdeki lawenê-cenay û eyştê hetani derewo ki deey aver dî. Dîma ageyray kaviranê mexara ser û enawa va:

— «Oxmo, na dina dîr bê şiwane zi, bê kutik zi kê şiyênenê bi manê. Labrê heyana ki ma na fahm bikerim kê hergu hewî ehendi qırbanan bîdiy se. zaf rew cusê ma wedarêno. Balê genêbo şima çimanê xwî akerê ki, ewro ra pey eger hewina kutiki, hela ay kutikê ki xwî verg zanê, kutikê zûrkeri mesletê şima bibê, şima bışenê pesi inan dest dî nê verdê û xwî ser deh bikerê!» -1946.

Tadayox: M. Dewij

# ZARGOTIN (Çiroko Geli)

## Şiretê Kali

Vanê cay dî wextê dî padişayeki bî, wezirê xo ra. Padişay wezirê esto. Roji veciyay suk ra teber. Suk ra veciyay kî jew kalîkeki ha ronişto. Şiy va:

- «Silamu eleykum.»
- «Eleykum sîlam.» Va:
- «Tî yi sekene?» Va:
- «Ez aqîl roşeno.» Ê va:
- «Tî aqîl roşeni?» Padişa ravêrt, weziri va: «Vîndî kî ez xorî aqîl bigira.» Sî va:
- «Dedo aqlî bîdî mî!» Va:
- «Aqlî bê pere niyo, hirê altuni tî do bîdî ez aqîl tu da.»
- «Aha -va- to ri hirî altuni!» Hirî altuni day cî, kal himâ bî koktê wellî ro, va:
  - «Ino ê jew sere bo kî sîrrê xo kesi ri vano.» Wezir fini abirriya:
  - «La -va- nu tu aqîl niyo. Fina şero jewnâ bigira.» Sî va:
  - «Dedo mî ri aqîl bîde.» Va:
  - «Wîni bê pere niyo, bîdî hirî altuni!» Altuni day cî, va:
  - «Aha nu zi jew sere bo qewmdê xo ra abirriyo zoybi mîrdîma ra şîro.» Va:
  - «La nu wîna mî zi zanayni, fina ez şîra ey zi bigiro.» Sî va:
  - «Dedo mî ri aqîl bîde!» Va:
  - «Peranê xo bîde!» Hirîna altuni day, va:
  - «Ha nu jew sere bo, mîrdîmo kî mîrdîmê hukmati ra bawer

beno». Aqlê kali qediya. Wezir nayo rayir, şı pey ra resa padişay, va:

- «Tu sekerd?» Va:
- «Mı ri hiri hemey winiya wına va». Ey va:
- «Rind o»

Fina şı, geyray eger kı dina dı çendi gayray se geyray; çendi menga ra tepya fina ageyray saray, Saray dı kavireki padişay esto. Kavireki sava, werdi yo. Tim ü tim qeçekan ra piya şino bexçe. Weyniyay kı kavır padişay ri bol qedr o, weziri va: «Vindi kı ez tecribey ni aqılı kero hela rast o, rast niyo». Şıyo, kavirek tirit ü girot ard nimit ü şı jewna kavır girot ard qoti cı kerdi, veynda cenêrda xo, va:

— Cenêkı bê! Mı kavireki padişay tiritto ma qotê cı keri xoribori». Cenêkeri:

— «Ey -va- ridn o? «Cenêkeri ra piya şiv kavır qotê cı kerdi poste kerdi, goştê cı werdi kerdi, nay ser, werdi. A roji padişay delal dawo venda:

— «Kavirê mı koti viciyo se do idam kera, bıyari». Roci, didi, hiri delali venda venda kavır çınıyo, mend. Hiri roci ravêri tepya se weziri ya:

— «Cenêkı mırı tasê aw biya!» Cenêkı nêruway. Va:  
— «Cenêkı tiya ez to ra aw wazena, tı çıçı nêruwena». Cenêkı va:

— «Tı cı ri pêtê xo ani?»  
— «Liya -va- mı ri aw biya!» Werîst çıwey vist cı. Hama cenêkı:  
— «Wey -va- to kavirê padişay tiritto howna tı finenê mı zi!  
«Hama xo verra da şiy huzirdê padişay va:

— «Padişay mı, Ella umrê to dı bo, kavirê to weziri tiritto, qotê cı kerdo, werdo zi». Padişay hema derhal hendo kı hêrs bıyo, idamê weziri do vet. Fermanê cı ard. Wezir ame kı şero saray, senê kı şı se hama tepiştiyo fermanê cı kerdi mil ü va:

— «Ney beri dar dı ki!» Giroti kı çarşı ra berdi dari ver se, hemeyê ahaliyê çarşı arêbiya dîma wuniya, va:

— «Wax wax weziri beni dar dı keni!» Tanini va:  
— «Kavir tiritto!» Tanini va:  
— «Heyf cı ri...» Birazzakên dê weziri esti bi. Weziri biray xo dew ra qewirna bı, wuca dı hemaley kerd bı, piy cı zi merd yani biray zi merd bi. Bırazayanê cı est bi. Va:  
— «No çıçı yo wino?» Va:  
— «Weziri benê dar dı kenê!» Va:  
— «La wezir dedê min o, qandê çıçı?» Va:

- «Kavîrê padişay tîrito!»  
 — «La -va- kavîri ez şêro padişay ri biga». Şî va:  
 — «Nîka ez kavîri bido nê beno?» Va:  
 — «Nê!» Va:  
 — «Dîdîni?» Va:  
 — «Nê!» Va:  
 — «Desîni?» Va:  
 — «Nê -va- seyinê zi bigiri nê beno, illa weziri dar dî keri.»  
 «Ageyra tesliya cey kewti Dîma vazda şî ki berdo darı ver, kendiri  
 ci zi hazır kerdi. Weziri ri va:  
 — «Vatişê to esto?» Va:  
 — «Ney». Va:  
 «Wîniyo se, kendiri b'erzi qırri!» Kendir kerd ki weziri qırri se,  
 nê birazay ci xo eşto kendir girot û kerd xo qırri. Cellatka kardi eşti  
 kendir, nê verda. Fîna vîrasti, fina kendir berdi qırri, fina birazay  
 kerdi xo qırri. Vano: «Vera dedi mî dar dî keri». Hirî fini eşt xo qırro  
 pusnay welhasuli. De weziri zi va ki:  
 — «Padişayo senê bê ifade kesi dar dî keno?» Xeber day padişay  
 va:  
 — «Rast vato, wîniyo se ina bîyarê! «Şiy, wezir û biraza ardê.  
 Padişa weziri ra va:  
 — «La tiyo se vani? Qey to bêbextiyê kerdi mî, kavîrê mî tûrit?»  
 Weziri va:  
 — «Hal mesela wîni ya. Mî aqlê kali cerebnay, heme zi rest  
 vîciyay. Ey verêni: mî sîrrê xo cîniya xo ri va. A zi amey to ri vat.  
 Diyîni: mî bîray xo qewirna, mî xeletey kerdi. Birazay mî ame, mî  
 vera xo eşt merg. Hirêni: mî to ri bol xîzmet kerd bi, fina to qedrê mî  
 zey jew kavîri nê zana. To waşt kendir mî qırri keri, mî dar dî keri.  
 Mêrdimê hukmati ra bawer bîyâş zi xelctey a. Şiretê kali heme  
 rast vîciyay». Padişa poşman bi, va:  
 — «Ezo to ef bîka, ti fina wezireya mî bîki». Wezir ageyra va:  
 — «Keso ki qedrê mî henda jew kavîri nê zano, ez rê wezirey nê  
 keno, ez nîka ra tepya şiretanê kali tepişeno.»
- (— Na çiroka gelî dormarey GERGER (Adiyaman'ı ra giyreve) —)

# ZARGOTIN (Stranek Jı Wêşeya Gelêri)

## Şerê Xalîta

Delana, xweş Delana!

Pêşîya malê me şer e, paşıya malê me ferman al

Şerê feqirê Êzidiya, sofiyê Mîsilmana

Xweştir e ji şerê nêri û berana!

Delana Başo, wa bî şitîl

Çend peyayê Mala Zoro lî serê gîrê Qereçêri bûne gutul

Derbekê, dane Hesarê Cibo û Bimbaê Miro, Miçoê mala Şêx Isa  
Jî mala bavê mî qelandin tovê bist û pênc mîrên, rimbîqetîl.

Delana Başo, lî berê bendê

Mertala destê Hesarê Cibo gîran e, kete zendê

Şerê feqirê Êzidiya û sofiyê Mîsilmana

Xweştir e ji reqs û govendê.

Lê darê! Delana!

Pêşiyê malê me şer e, tali ferman a!

Pêşîya eşirê Êzidxan çûye tîla Botana.

Delana Başo, bî qîrkor e!

Hespê Bişarê Zoro di meydanê de bore bore.

Derbekê dane lî Hesarê Cibo, Bimbaê Miro,

Jî mala bavê min qelandin tovê bist û pênc şêxê serbîpor e.

*Şanek:*

Ev stran jî hejmara 54,15 Gulan 1943 yê

Kovara Hawar'ê, bê guherandin hatiyê

welgartîn.

## ZARGOTIN

### Lawij

Ezê li Xana Gosehê fekirim, aлиki jê hernifti.

Ezê li dora girê Niskin fekirim, sosin ú beybûn tê re bışkıfti.

Xwezika wi lawi; du yar li gundi hebin, êk yar be, ya di dezgirtti.

Ezê li Herekolê fekirim, ne mane kevi.

Dora Kani Ferşikê nêrim, porjan lê bine dar ú devi.

Ezê terka lawikê xwe nadim heta Korkendil bîhele.

Jî min ú lawikê min re bibe gakêl ú zevi.

Ezê li Mêrgûmarê fekirim, mirê hemi besta

Li Herekolê fekirim, keviyo lê bine mina tiliyê destä

Xweizka min behr li bejna bîlind hebiya,

Bila Xwedê emanetê xwe jî min bixwesta.

Ezê li Arnosê fekirim, mirê hemi çiya

Lehi jê derbine, dicin ser milkê Kaxpiya,

Ezê çengilê keleşgewra xwe bigrim, birevinim, bibim nav male

Qoçebegiya.

Ezê li Axyolê fekirim, ci çiyaki xezeb e!

Ezê li Arnosê fekirim, qentarê nêriya lê bine celeb e.

Evinika xelkê dünya alemê hemi li ser dev ú lêvan in,

Ya min, rebena Xwedê, tinê jî dil ú kezeb e.

Qulingo, Xwedê ki ezê nîzanîm ne tu koçer i, ne holis i.

Taviki baran dîbarê, piçkê berfê ser çengê te direqisi.

Dema rêka te li Cizira Bota bîkevit,

Tu jî ber min ve keyfa zeri esmera bipirsi.


Goyino, xîrabo, çire dengê te li min nayê?

Tu sibeha dixwini li gumbeta Cûdi.

Êvara xwe tavêji beroji Saravayê

Tu kîrasê belgê mishefê wergiri, bawerîya mi li te nayê.

(HAWAR 15 Gulân 1943, Hejmar 54)



## Zazaki Dır Vatey Verinan

ARÊKERDOX : DEWIJ

### — A —

- 1 — Altuni ancax serraf şinasneno (şırasneno).
- 2 — Altun, vist serri wellî dî bîmano, hewna (rayna) altun o.
- 3 — Aqilo sıvik, baro gîran.
- 4 — Aqlî peran reydî nê roşêno.
- 5 — Aqlî pil û şeniki nê persoно. / Aqlî, qîj û pilleya niyo.
- 6 — Arê bî şeytoni nê viraziya wo.
- 7 — Armeni va: «Lîngî (ningî) pizzi çärneni».
- 8 — Armeni va: «Ez Bisilmane biyo kî ez germiya duymî boro. (biwero).»
- 9 — Armeni va: «Kê çendi roji betal biy, kê ehendî roji veşan maneni».
- 10 — Arsız çekerdo ro, fina ar nê kerdo.
- 11 — Aşiko kelebiyaye, def dîrneno. / Aşik kelêba, def dîrriya.
- 12 — Aşiki ri Bexdad gami ca o.
- 13 — Aşiqi ri Bexdad yew gam a.
- 14 — Awa vinderta ra biters.
- 15 — Aw çiqas goli dî mendî, ehendî buy dekuweno.
- 16 — Axay rê vanê: «To rê imbarîk bo», feqiri rê vanê: «To rê koti ra?»
- 17 — Aya kî kê bikero (biki) xwi, yawer (çew) nişno bikero (biko) kê.
- 18 — Aya kî (çı kî) çarey kê dî nuseya, kê veyneno.
- 19 — Ayo kî rayiron dî rakuwo, hewno zi veyneno.
- 20 — Ayo kî zaf bigeyro, tayı vini keno.
- 21 — Ayre (arê) bî newb a.

— B —

- 1 — Banberbiyaye, kelebiyayi -ra- xidarêr o.
- 2 — Banderbiyayi bander me kî, ti bander kerdî (tu bander kerd) xwi vir me kî.
- 3 — Banê zûray veşawo, yeweri tira ina-n nê kerdo.
- 4 — Barê mérdimdê sêkurri çewt o.
- 5 — Barut û adır yew ca dir nê beni.
- 6 — Belli (Bellu) kulçi ra va: «Qina tu hêre ya.», Ay va: «La ti hima mi ra kewta.» / Belu cift ra kewt va: «Na qena tu çi hera ya.», va: «Hera mera, ti zi mi ra kewta.»
- 7 — Beli kulçi (qaf) ra kewt va: «Qey ez ina pis ra wo?»
- 8 — Beyntarê teresey û camêrdey-dî- yew müy a.
- 9 — Bê ar çekero (çeng kerdo) adiri miyan, vato: «coli (izimi) terni.»
- 10 — Bî dor, ne bî zor.
- 11 — Bî estorbê şari, kê espar nê beni.
- 12 — Bitrey (qurreyey, payedarey) ga y citî ri zi nê manena.
- 13 — Bî xebetê sey Armino, borî sey (hezey) miri.
- 14 — Bizza gerrini, çime y eyni ra aw wena.
- 15 — Bızı kî qına yay keniyay, şona nanê şiwani (şanî) wena.
- 16 — Bina heramî, timo çinna. / Bina heromî timo ricêna.
- 17 — Bûy (Boy) gûlî ri, paşkil telli ri.
- 18 — Bunder bî (Bander bî), meki.

— C —

- 1 — Cawo kî adır tedir çinno (çını bo), dûy tira nê vecêno.
- 2 — Cay darban weş beno, cay qalan weş nê beno.
- 3 — Cay camêrdi yan binê ardan o, yan pey caxan o.
- 4 — Cay kotek beno weş, cay nenga nê benê weş.
- 5 — Ciwalo veng xwi sero nê vindeno.
- 6 — Cirane çukîs, kê wayirdê hajda zerrênen keno/Cirano mexenêt, kê keno wayirê haca zerrêni.

— Ç —

- 1 — Carey heme ci esto, ê mergi çinniyo.
- 2 — Carey mérdimê raştî tim tokerde wo (berz o)

- 3 — Çew (yew) do (dû) y xwî ri nê vano tırs/Cow do-dê xwî ri nê vonu tırs.
- 4 — Çendi (Çındı) aw bir dî mendi, endî bûyını bena.
- 5 — Çi bîda destâ-n, çi bigeyra linga-n.
- 6 — Çi gure (gîrwe) esto wa-bî- xeyr bo.
- 7 — Çimê veşani, firaqan dî wo.
- 8 — Çîmo pawîte, qırş dekuweno.
- 9 — Çîqa ko berz bo, çipa aroşı takûna.
- 10 — Çi ri şeytoni veyneni, çi ri qu llowella waneni.
- 11 — Çîwa, cennet ra hameya (vajiyaya)./Kotek cinnet ra vijiyaya.
- 12 — Çiyo kî şî, nino.
- 13 — Ci y teresi weray-ba camêrd (cümêrd) i.
- 14 — Ci sey (hezey) çîwa zori niyo.
- 15 — Ci sey (zey-hezey) peri niyo.
- 16 — Çiy imbazi (hembazi), kê çim dî xışn kerêno.
- 17 — Çiy ina dina, ina dina dir maneno.
- 18 — Çiyo kî şî, dima mekwi.
- 19 — Cuwalo veng, pay nê vindeno.

# FERHENGOK

## KURDİ-TIRKİ

### — A —

abori	: ekonomi, ekonomik	béjezani	: sözcük hazinesi
afirandi	: yarattılmış, ken- diçe oluşturul- muş	bêna	: sonsuz, ebedi, si- nirsız
ajobêna	: süregen, sürekli	bê serûber	: düzensiz, dağınık
akam	: sonuç, etki	bijûn	: sağlık
alikari	: yardım	bijûndar	: sağlıklı
arizi	: özel	bikaranin	: kullanma, kulla- nim
avjenî	: yüzme, yüzüş	bikar anin	: kullanmak
awarte	: ayrık, istisnai	binedani	: alt/dip işaret
azin	: yöntem ,metod	binedanidar	: alt işaretleme, alt içaretlenmiş

### — B —

balûpal	: engin	bışaftin	: çözümlemek
bej	: kara parçası, kîta	(bibîşefê)	: yabancı
berêz	: sayın, muhterem	bîyan	: uğraşı, meşgul
berpirsiyar	: sorumlu	bli	: uğraşmak, meş- gul olmak
berpirsiyari	: sorumluluk	bli bûn	
bersiv	: yanıt, cevap	boş	: bolluk
bêje	: sözcük, kelime	boşahi	: kalabalık, izdi- ham
		bûyer	: olgu

**— C —**

celeb	: tarz, tür
cıvak	: toplum
cıvaki	: toplumsal, sosyal
cur	: çeşit

**— C —**

çande	: kültür
çandeyi	: kültürel

**— D —**

daraz	: yargı
derbasok	: geçit, geçiş kış- tağı
devok	: ağız, aksan
díviyahi	: gereksinme, zo- runluluk
dirok	: tarih
drûvandın	: benzetme, benze- tiş, benzetmek

**— E —**

egeri	: gerekçe
-------	-----------

**— F —**

ferma	: resmi
fermo	: buyurun
fikare	: endişe, kaygı

**— G —**

gehinek	: evre, aşama
gelavêj	: 21 Ağustos - 22 Eylül arası, bir yıldız

gelér	: halka ilişkin
gelş	: müşkül, sorun
gengaz	: mümkün
gengazi	: imkan, olanak
gerdün	: evren, kainat
geremol	: karmaşa
gıram	: saygı
gıramgır	: saygılı, hürmet- kar
giring	: önemli, mühim
giringahı	: önem, ehemmiyet

**— H —**

hedan	: sabır, dayanç, da- yanma
hedar	: istikrar, karar, sükunet bulma
helbest	: şiir
helbestkari	: şiarlık
hemberi	: nisbet etme, re- kabet
hevdeng	: eşsesli
hevvelati	: yurtaş
heyman	: çağ
hêtün	: sanayi ocağı, fi- rını
hilberi	: ün
hilberin	: üretim
hinartin	: postalamak, gön- dermek
hinermend	: yetenekli, mahir
hoy	: koşul, şart
hoyandın	: koşullandırmak, şartlandırmak

**— J —**

jêmaye	: miras
jindar	: canlı, yaşayan

**— K —**

karak	: cevher, maden cevheri
kargeh	: işyeri, fabrika, atölye
karin:	iktidar, güç.
kerane	: çekiç, orta boy çekiç
kesdar	: somut, müşahhas
keşti	: gemi
kevnare	: klasik,

**— L —**

lêker	: fiil
lê marqilin	: farkına varmak, fark etmek

**— M —**

makezman	: anadil
mendal	: çocuk
méjû	: tarih
mêjûyi	: tarihsel
mêtigneh	: sömürge
mêtînghkar	: sömürgeci
mêtînghkari	: sömürgecilik
mêtinkar	: sömürücü
mêtinkari	: sömürücülük
mixabın	: yazık, hayfa

**— N —**

navdêr	: isim, (dilbilgisel)
navgin	: araç, vasıta
neferma	: sivil
nemaze	: özellikle
nivîst	: nüsha
nivisanî	: yazma ilişkin

niviskari	: yazarlık, yazarlığı ilişkin
nir	: boyunduruk
nivro	: güney

**— P —**

parastın	: korumak
pardarı	: ortaklık, müste- reklik
pele	: ülke
peri	: armağan
peyitendin	: ispatlamak
pêjn	: duygular, his
pêjnandın	: duymak, his et- mek
pêdandin	: tesbit etmek, sa- bitleştirmek
pênüs	: kalemler
pênuşgir	: yazınaya yete- nekli
pêşbir	: erek, hedef
pêvajo	: süreç
pêwar	: lokal, yerel
pırsıyar	: problem, sorun

**— Q —**

qad	: alan
-----	--------

**— R —**

raber kirini	: sunuş, sunu-
raçandın	: türetmek, türet- me
ragıhandın	: iletmek
rewal	: büyüğü terlememiş delikanlı
rexne	: eleştiri, tenqid
rexnegiri	: eleştirel
rêpani	: gözleme, intizar

rik	: inat	vejandin	: yaşatmak, diriltmek
rikoyi	: inatçı	vexwendin	: davet etmek
romızı	: gündelik, yevmiye	vén	: irade
		vênmend	: iradeli, irade sahibi
	<b>— S —</b>		
sindan	: örs		
			<b>— W —</b>
	<b>— T —</b>		
tégihan	: anlam	war	: alan
tégihandın	: anlatmak, kavratakmak	weşandın	: yayinallyamak
tégihıştin	: anlamak, kavramak	weşin	: yayınlanmak
têrkir	: yeterli, yetkin	wêje	: edebiyat
têvel	: farklı		
tiqûtenê	: yalnız, yalnızca		<b>— X —</b>
tika	: rica	xunaftın	: sindirmek, özümsemek
tip	: harf	xunifandın	: özümlmek
trali	: tembellilik		<b>— Y —</b>
tund	: yoğun, kësif	yêmayî	: kalıcı
			<b>— Z —</b>
û.h.w.d.	: û her weki di, v.b.		
	<b>— V —</b>		
vatını	: görev, ödev, mecburiyet	zargotin	: folklor
		zayok	: doğurgan
		mengi	: ideal
		mengiwer	: idealist

# ZAZAKİ (Dımlı) - TIRKİ

## — A —

abırriyayış	: ayrılmak
adê	: o, onu
adir	: ateş
ageyrayış	: dönmek
akerdış	: açmak
apey	: geri, geriye
aqıtayıyış (atıqayıyış)	: ayrılmak, kopmak
arê (ayre)	: degirmen
ar kerdiş	: pişman olmak, tövbe etmek, utanmak
arê kerdiş	: toplamak, derlemek
arrizi	: özel
aruş (argoş)	: tavşan
asan	: kolay
aver bıyayış	: ilerletmek
ay	: o, onlar
aya (a)	: o (dişi için)
ayê	: onlar
ayna	: onlar
ayo	: o (erkek için kullanılır)

## — B —

balê	: hiç olmazsa, bari
------	---------------------

bander (bonder)	: alısmak, öğrenmek
bawer bıyayış	: inanmak, güvenmek
bedeliyayış	: değişimek
belli (bellu)	: palamut
berpirsiyari	: sorumluluk
berrızyayış	: bağırınmak, çıkışmak
berz	: yüksek, yüce
beyntar	: ara
bincaran	: temelli, kökten
bitirey	: şımarıklık, büyülük taslamak
bin	: diğer
bir	: kuyu
bêdin	: dinsiz
bê hemd	: istemeden, gari ihtiyarı
bêxeyja (bêxeyra)	: olmaksızın, hariç, dışında

## — C —

ca kerdiş	: bulmak, saptamak (tesbit)
-----------	-----------------------------

camêrdek	: korkmayan, yi- ğit, erkekçe dav- ranan
cax	: parmaklık
celeb	: hayvan tüccarı
cematkî	: toplumsal, top- lumca
cenayış	: çalmak (çalğı çalmak)
cerebnayış	: denemek
ci	: o, onu, ona
cedi kerdiş	
(cêra kerdiş)	: paralamak, pa- ramparça etmek
dif	: nefes
coka	
(cuwera)	: bu nedenle, bundan ötürü
cus	: soy
cusin	: asıl, soyiu
cûserra	: tan vakti, şafak vakti

### — C —

çande	: kültür
çarñayış	: dolaştırmak, gezdirmek
çekerdiş	
(çeng kerdiş)	: fırlatmak, at- mak
çeqal	: çakal
çibenok	: bilmecə
çini bîrnayış	: gözü kesmek
çime	: kaynak, göze
çim ver	
...dayış	: göz koymak, gö- ze ilişmek
çip	: ayak, baldır
çirok	: hikaye, öykü
çitale	: mensucat, bas- ma, bez eşya

çukis (çikod) : cimri

### — D —

dar di kerdiş	: asmak, idam et- mek
daristan	: orman
darober	: ağaçlıklı
ded (dat)	: amca
dekwetış	: içine düşmek
delal dayış	: tellal çağırıtmak
dem (deme)	: zaman
dejnayış	: acıtmak, ağrit- mak
derdo	: ezgi, uzun hava
destan	: destan
dest pey	
kerdiş (dest	
pey kerdeni)	: başlamak
deyir	: türkü, düğün havası
deyirê zerrî	: aşk türküsü
dîm kewtiş	: peşine düşmek
dirok	: tarih
dormare	: civar, yöre, et- raf
durik	: ağıt, iş türküsü
dutış (dotış)	: sağlamak

### — E —

ehendîna	
(endîna,	
îndîna)	: bu kadar daha
eksow	: şayet, eğer
enawa	
(inawa, wîni)	: böyle
enê (nê)	: bunlar
erinayış	: satınalmak
erjaye	: değerli, değer, kiymetli

erra kewtiş : yere serilmek  
 erşawitiş : göndermek  
 espar : atlı, süvari  
 estaneki (istaneki) : masal  
 estor : at  
 eşnawitiş : duymak, dinlemek  
 ewro (eyro) : bugün  
 ey : o  
 ey : ama, evet, sonra, peki  
 eyştiş (eştiş) : atmak  
 eyştiş xenceri : hançerlemek

### — E —

ê : onlar, o

### — F —

fahm kerdiş : anlamak  
 fesle : ara, fasila, süre  
 fetelnayış : kovalamak  
 fetesiyyayış : boğulmak  
 fina : yine, tekrar  
 firaq : tas, tabak, kap  
       : kacak

### — G —

ganiyey : canlılık, yaşam  
 gel : halk  
 gelér : halksal, halka  
       : ait  
 germiya : bir çeşit ayran  
       : çorbası  
 ger : uyuz  
 gerre : şikayet

gêsti : fazla açıkma  
 gılana : yine, tekrar  
 gılangi : bir keresinde  
 gıran : ağır  
 gırd : büyük  
 giring : önemli  
 goştii : kavurma  
 gure (gırwe) : iş

### — H —

hac (hâjî) : ihtiyaç  
 hagidar : farkında olma, kollama  
 hasayış (asayış) : görünmek  
 heb : tanıe  
 helbestvan (helbestkar) : şair  
 henda ki (hindî ki,  
                   ehendî ki) : o kadar ki  
 hergu : her bir  
 hêmele : hemele  
 kerdiş : gürültü patırtı etmek  
 herr ü hera : çok geniş, genişçe  
 het : yan, taraf  
 hetani : kadar, dek  
 hewwa : gibi, çeşit  
 hewna (heyna) : bir kez daha  
 hewn diyayış : rüya görmek  
 hêrs bıyayış : kızmak, sınırlenmek  
 hêşyar kerdiş : uyandırmak, uyarmak  
 hilber : ürün  
 hına : daha

huniyo (hūniko)	: işte, budur, bur- dadır
hir	: bozkır, kırac
hunermend	: arazi : sanatçı, becerik- li

— J —

inan	: onlar
------	---------

— J —

jew (yew)	: bir
-----------	-------

— K —

kavır	: kuzu
keftar	: 1) çok yaşlı, 2) sırtlan
kelebiyaye	: kudurmuş, huy- suz, rahatsız e- den
kemane	: eksiklik
kemi	: eksik
kemzanaye	: az bilen, iyi bil- meyen
keniyayış	: kaşınmak, ka- zınmak
kişit (kiştı)	: taraf, yan
koli (izim)	: odun
kovar	: dergi
kulçi (cift, qaf)	: palamut yuvası, kabuğu
kû (ko)	: dağ
kûyi	: dağlı, vahşi

— L —

la	: ama, ya
----	-----------

labré	: ancak, ama, an- cak
lawayış	: havlalamak
lilik	: ayna
lec	: savaş, kavga
lem	: ağaç, bodur ağaçlar

— M —

matmendeki	: şaşkınlıkla
ma vajim	: örneğin, diyelim ki
mendox	: kalan, kalıcı
meng	: ay
meslet bıyayış	: musallat olmak
metelok	: fıkra
mexenet	: cimri
mêşna (mey)	: koyun
miclewrr (mijlowr)	: karınca
mirdal	: leş, hayvan ölü- sü
mîyan	: ara
miraswer	: mirasyedi
musayış	: öğrenmek, alış- mak

— N —

nayış rayır	: yola koyulmak, yola düşmek
nebaş	: kötü
neng (leng)	: küfür, sövgü
netewe	: ulus
ney	: bu, bunu
nêweş	: hasta
nîmac	
(nímaj)	: sabah, namaz
nîmitiş	
(nínitış)	: saklamak
nîwiskar	: yazar

nıwişte (nuşte)	: yazı, yazılı, muska
nıwiştox (nuştox)	: yazar, yazan
ni	: bu
nusxa	: nüsha

pêser kerdiş	: biriktirmek, derlemek
pırník	: burun
pırtük	: kitabı
pıyor (pêro)	: hep, hepsi
pilley	: büyülük
piya	: birlikte
pizze	: karın

## — O —

cqyanos	: okyanus
owniyayış	
(wuniyayış,	
winiyayış)	: bakmak

oxmo : meğer

## — P —

palax	: sonbaharda yer- de kalan yaprak veya ekin biri- kintileri
pardari	: pay, görev
pars	: pars
paşkil	: tekme
paşti dayış ...	: destek olmak
pawitış	: korumak, bekle- mek
pawiteyoxey	: bekçilik
payedarey	: kibirlilik, üstün- lük taslamak
paye kerdiş	: kurumluluk, üs- tünlük taslamak
pav (pay ra)	
vindertiş	: ayakta durmak
pey	: sonra, arka
peyeni (peyni)	: son, sonunda
peymende	: miras
pênuş	: kaleml

qalayış	: melemek
qandê	: için, bu nedenle
qecek (qicek,	
qij)	: çocuk
qedr	: değer, kıymet
qelew	: şişman, dolgun, gelişkin
qe nébo	: hiç olmazsa
qewirnayış	
(qowrnayış)	: kovmak
qineste	: kalça
qırri (qırriki)	: boğaz
qijji	: bağırtı, haykırış
qirri	: bağırtı, haykırış
qoçi kerdiş	: boynuzlamak
qoti ci kerdiş	: kesmek, kafası- nı kesmek
qurreyey	: büyülük tasla- mak

## — R —

rakewtiş	: yatmak, uzan- mak
ramitiş	: sürmek
rast viciyayış	: doğru çıkmak
raşte	: meydan, düzlük
ray kerdiş	: yollamak, gön- dermek

ravêrtiș	
(vêretiș)	: geçmek
rayna	: yine, tekrar
recefiyayıș	: titremek
remayıș	: kaçmak
resayıș	: yetişmek, olgunlaşmak
rexne	: eleştiri
reydi (reyra)	: ile, birlikte
rêz kerdîş	: dîzmek, sıralamak
rıcıyayıș	
(rıjeyiș)	: yıkılmak
rikêf kerdîş	
ser	: üzerine hûcum etmek, üstüne vürümek
rîştiş	: göndermek, yollamak
rojname	: gazete
roşeyiș	
(roşiyayış)	: satulmak
roşn	: aydınlık, ışıklık
ruwayiș	: gitmek

— S —

sanayi	: sanayi, endüstri
sava (sabe)	: yeni doğan ku- zu v.s.
sazuman	: düzen
senê	: nasıl
serebirnayıș	: hayvan kesmek
sererast	: düzenli, yolunda
ser nayış	
(nayış ser)	: pişirmek, kaynatmak, üstüne koymak
seser	: yüzyıl
sew (zow)	: eğer

sey (zey,	
hezey)	: gibi, kadar
sékur	: yetim, öksüz
süstek	: gevşek
sıud	: şans
sowkı	
(zow, eksow)	: şayet, eğer
— S —	
şaristan	: kent, şehir
şatiyayıș	: zayıflamak, bozulmak
şenik (qıj, qit,	
werdikek)	: küçük
şerm	: ayıp, utanma
şidênayış	: sıkıştırmak, sağlamlaştırılmak
şinasnayış	
(şırasnayış)	: tanımak
şinayış	
(şiyayış)	: yapabilmek
şiret	: öğüt
şuxilnayış	: kullanmak, karıştırmak

— T —

tadayox	: çeviren, çevirmen
ta kewtiş	: takılmak
tayi (tani)	: bazı, biraz
tamijuyayış	: tadını almak, tadına alışmak
teba (towa)	: şey, nesne
telli (tellu)	: diken
tenya (tena)	: yalnız
tesli kewtiş	
(kewtişê tesli)	: ümidi kesilmek, vaz geçmek

təpya (tepa,  
 apey) : geri  
 tepiştis : tutmak, yakala-  
               mak  
 tê fek vîstis  
 (eyştiş tê fek) : hepsini birden  
                   dövmek, tümü-  
                   ne vurmak  
 têj : keskin  
 tê miyan  
 kewtiş : birbirine gir-  
               mek, birbirine  
               karışmak  
 têşanayış : sallamak, silk-  
               mek  
 tikê : azıcık, biraz  
 tikûtena : yapayalnız, yal-  
               nızca  
 tim û tim : sürekli  
 tiritiş  
 (tirawitiş) : hırsızlık yap-  
               mak, çalmak  
 tiro cenayış  
 (tiro kerdiş) : sokmak, batır-  
               mak  
 tik : rica  
 titik : en uc, en yük-  
               sek yer  
 to kerdiş : sıvamak (paça-  
               yı sıvama)  
 tujar (têjir) : tüccar

### — Ü —

úmar : sayı

### — V —

vajeyiş  
 (vajiyayış) : söylenmek  
 vatey verinan : atasözleri  
 vendayış

(veyndayış) : çağrırmak  
 veng : ses  
 veng : boş  
 vera şiyayış : karşılaşmak,  
                   önüne doğru  
                   gitmek  
 ver kewtiş : önüne düşmek  
 ver kewtiş : üzümek  
 verê verkan : en önce, ilkin,  
                   her seyden ev-  
                   vel  
 vero ameyiş : karşı gelmek,  
                   karşı çıkmak,  
                   yanısira gitmek  
 verradaye : boşanmış, boşta  
                   gezen, salınmış,  
                   serseri  
 ver resayış : yanına varmak  
 veşayış  
 (veyşayış) : yanmak  
 vêr : geçit  
 vilêşnayış : eritmek, ovmak  
 vindi (vin) : kayıp

### — W —

wa : olsun  
 wayır : sahip çıkmak  
 veciyayış :  
 wedariyayış : ortadan kaybol-  
               mak, ortadan  
               yok olmak  
 weqefiyaye : çok korkan, kor-  
               kak  
 weray : layık  
 werdi diyayış  
 (wirdêk  
 diyayış) : küçük görmek  
 werdi kerdiş : kesmek, ufak u-  
               fak hale getir-  
               mek

wemıştış-  
 roniştış : (birisiyle) oturup kalkmak  
 werrek ardış : imrenmek  
 wesefiyeyiş : övünmek  
 weşanayış : savurmak, sallamak  
 wes bıyayış : iyileşmek  
 weyniyayış (owniyayış) : bakmak  
 wêje : edebiyat  
 wîni (inawa) : öyle  
 wir : her  
 wuca (ayca, orwa) : orası, ora

### — X —

xebat : çalışma, çaba, mücadele  
 xelesiyayış : kurtulmak  
 xeletey : yanlışlık, hata  
 xidar : yaman, şiddetli  
 xırab : kötü  
 xışın (xışn) : büyük  
 xwı ser deh : başından sav-

kerdiş : mak, atlatmak  
 wxı tê bına  
 kerdiş (wxı yewbina bınra kerdiş) : birbirine sokulmak  
 wxı ver şanayış : önüne katmak, yüklenmek (kullanmak)

### — Y —

ya : o (dişi için)  
 yêni (ini, jini) : onlar, onları

### — Z —

zerwes : mutlu, neşesi yerinde olan  
 zerba xwı : gönlünde  
 zerrên : altından  
 zey : kadar, gibi  
 zidi : güç, takat  
 zorkani : zorla  
 zoybi (sowbi) : başka  
 zûrker (zûra) : yalancı

# İçindekiler / contents

Sunu	3	Introduction	3
Çağrı / Serxas ARDA	7	Invitation / By Serxas ARDA	7
Bu Dili Nereden Getirdin?		Where did you find this	
(Anı) / Flit TOTANI	9	language?	
		(A reminiscence) /	
Rojen BARNAS'tan şiirler:		Flit TOTANI	9
● Ben Dört Yaşında Bir		Poems by Rojen BARNAS:	
Çocuğum Amca	15	● I'm a child four years	
● Nasihatçı Molla	17	old	15
● Yaşantı	20	● Adviser Molla	17
● Gülümse	21	● Living	20
Nereye Gidiyorlar (Öykü) /		● Smile	21
M. ŞEFİQ	23	Where do they go (A Story) /	
Zaman Bilir, Altın Bilir, Zor		M. ŞEFİQ	23
Bilir (Öykü) /		Time Knows, Gold Knows,	
Feridun SALAR	27	Force Knows (A Story) /	
Mem RONGA'dan şiirler:		Feridun SALAR	27
● Bahar Önce Şiirlere		Poems by Mem RONGA:	
Gelir	34	● Spring begins with	
● Kapıname	35	flowers	34
Çeviri		● On the doors	35
● Onlar (Şiir) /		Translation	
Nazım HİKMET	36	● They (Poem) /	
● Şarkılarım (Şiir) /		Nazım HİKMET	36
Nazım HİKMET	38	● Our songs (Poem) /	
● Koyun Masalı (Öykü) /		Nazım HİKMET	38
Sabahattin ALİ	39	● A tale on sheeps	
Folklor		(A Story) /	
● Eskilerin Öğütleri		By Sabahattin ALİ	39
(Halk Öyküsü)	43	Folklore	
● Xalit'ların Kavgası		● Ancestors advices	
(Ağit)	46	(folk's tale)	43
● Ağit	47	● Xalit's battle	
● Zazaca Atasözleri	49	(a wailing poem)	46
Sözlük	52	● A wailing poem	47
		● Proverbs in Zaza dialect	49
		Glossary	52



H.U.